# Berbang

ORGANA FEDERASYONA KOMELEYÊN KURDISTANÊ LI SWÊDÊ

Hejmar: 94, Adar 1994 Fax: (46) 08-650 21 20 Tel: (46) 08-652 8585



# BILA HELEPÇEYÊN DIN NEYÊN JIYANDIN

✔ Di 16-ê Adarê de 6-sal li ser bomberdimanên kîmyewî û bîyolojîk yên li hemberî bajarê kurd Helepçe derbas dibin.

✔ Nuha Kurdên Kurdistana Iraqê, Helepçe jî di nav de, ji 2/3 xaka xwe rizgarikirne, û îro welatê xwe yê xerabkirî, ji nû ve avadikin.

✔ Lê Kurd dîsa pêwistiya wan jê heye, ku bala dinyayê li ser wan be û alîkariyê ji bo avakirina welatê xwe bibînin.

✔ F K K S bang dike ku hemû hêzên Mirovperwer, piştgiriya xwe ji bo têkoşîna gelê Kurd ya ji bo azadî û aştiyê diyar bikin.

Parlamentoya Ewrûpayê li ser pirsa kurd helwesta xwe nîşan kir:

**Otonomî ji bo Kurdan!** ☛ rûpel 2

**SîlehaTirkiyeyê pê de teqiya** ☛ rûpel 2

**Komîteya Penaberan ya FKKS li ser pirsên penaberên kurd bi dezgehên swêdî re çend civîn pêk anî.** ☛ rûpel 2

Li Swêdê hemû hêzên Bakûrê Kurdistanê bi hevûdû re Daxuyaniyek çapemeni belav kirin ☛ rûpel 5

**Îran bi robotan êrîşî ser gundên kurda dike.** ☛ rûpel 5

**Li Kurdistanê du rojnamevanên Swêdî ji mirinê filitîn** ☛ rûpel 6

**Ingela Mårtensson ji Tirkiyeyê vegeriya: -Rewşa Turkiyeyê ji her demî xerabtir e.** ☛ rûpel 6

www.arsivakurdi.org

# Sîleha Tirkiyeyê pê de teqiya

Li Tirkiyeyê, li dewleta ku endamê Konseya Ewrûpayê ye, li ser navê "demokrasiyê" maf û azadiyên sînorkirî jî ji ortê radibin. Organa Birêvebirinê, ya Qanûndanînê û ya Dadgehkirinê bi dîrektîfên "Konseya Ewleyî ya Neteweyî" ve hereket kirin û bi vî awayî perçê plana "çareserkirina" pirsa Kurd, yanî bi metodên leşkerî qirkirina gelê Kurd- yên para van hersê organanket jiyanê.

Hewildanên ji bo ku Partiya Demokrasiyê ji dervayî pêvajoya hilbijartinê bê hiştin, ji mêj de xuyadibûn. Tirkiye bi hemû organên xwe, xwe li ser çareseriyeke leşkerî konsantre kiriye û hemû îmkanên xwe li dij gelê Kurd bi kar tîne. Gelê Kurd bi giştî mîna talûkeyeke potansiyel tê dîtin.

Perçeyek ji vê potansiyelê li Parlamentoyê têkoşîn dida. Lê di 2-ê Adarê de bi darbeyeke nîvsivîlî xwestin vî dengê ku maf û azadiyên Kurdan ji kursiya parlamentoyê diqîre, rawestîne. Di 2-ê Adarê de bi biryara parlamentoya ku îrada wê tu carî azad nebûye, ji ortêrakirina immunîteta 7 parlamenterên Kurd, dadgirê ku beriya biryara Parlamentoyê emrê girtinê derxist û polîsên li ber devê deriyê Parlamentoyê ji bo girtina wan amadekirî, nîşana "serbixwebûna" organên dewleta ku xwedêgiravî bi "demokrasiyê" tê îdarekirin, bû; nîşana senaryoya bi dizî hatibû amadekirin, bû.

Piştî bihîstina vê biryarê li gelek platformên navneteweyî yên ku Tirkiye nemaze di vê sala dawî de, li dij gelê Kurd, mixabin ji ber sedemên diyar, hinek mewzî bi dest xistibû, dengê protestoya li hember vê biryarê bilind bû. Ev biryar û bûyerên ku bi vê biryarê dest pê kirin, di rojeva gelek platform û organên navneteweyî de bû xala ku herî bêtir munaqeşe li ser hat kirin. Biryara Parlamentoya Ewrûpayê, Nameyên Mîtterand, hewildanên Kohl, nameyên Jack Delors yên ji 32 dewletan re hatin şandin, danûstendinên serokê Meclisa Ewrûpayê Miguel Angel Martinez, ziyareta seroka Komîteya Swêdî ya ji bo Mafên Mirovî yên Kurdan û parlamentera Partiya Gel ya Lîberalan, Ingela Mårtensson ya Ankarayê; heyeta Partiya Kesk ku li merkeza Partiya Demokrasiyê lêkolînan dike; nameya serokê Partiya Sosyalîst ya Fransayê Jean Pierre Cot; hewildanên alîkarê wezîrê Karûbarên Derve yê DYA û gelek platform û şexsiyetên ku navên wan di vir de hilnayên, Tirkiye ber bi quncikeke teng ajotin. Êdî pêvajoyeke pirr hessas dest pê kiriye. Di vê pêvajoya hessas de Kurd divê li awayê bicîhanîna berpirsiyariyên xwe baş miqatebin.

Ger Kurd bikaribin ji vê rewşê îstîfade bikin, Tirkiye tu carî di quncikeke weha teng de nehatiye zevtkirin. Ev biryara Tirkiyeyê weha kir ku yên di platformên navneteweyî de, xwe diavêtin paş mertalê demokrasiyê û mafê Tirkiyeyê yê li dijî terorîzmê şerkirinê diajotin pêş û dixwestin doza gelê Kurd bi vî awayî bi tenê bihêlin jî êdî nema dikarin li Tirkiyeyê bi xwedî derkevin. Tirkiye bi vê gava xwe ve, bêçaretiya xwe ya di pirsa Kurd de kûrtir kir. Sîleha vê carê ya ku wê xwest li hember gelê Kurd bi kar bîne, bi wê de teqiya. Ev sîleh li gelek deveran jî li hev siwar bû. Ankaraya ku dixwest di her platformeke navneteweyî de, dengên ji bo piştgiriya gelê me bilind dibûn, bifetisîne û îmkana navneteweyîbûna pirsa Kurd tengtir bike, bi van kirinan pêvajoya navneteweyîbûna pirsa Kurd bileztir dike.

Ji bo reaksiyonên li dijî Tirkiyeyê yên di vî warî de xurttir û pirrhêltir bibin û di rêya bidestxistina maf û azadiyên gelê Kurd de bibin deskeftên(mewziyên) girîng, divê Kurd hem şiyana lêbixwedîderketineke bi çek û metodên rast nîşan bidin û hem jî ji tevgerên ku bi karakterê vê pêvajoyê re nelihevkirî, bi dûr kevin.

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê dê di qada xebata xwe de û li gor sewiyeya fonksiyona xwe berpirsiyariyên xwe yên di vî warî de bi cîh bîne û dê çalakiyên ku heta nuha hatine kirin, xurttir û berfirehtir bike. Federasyon ji bo biserketin û bi tesîrbûyîna van çalakiyan û bicîhanîna berpirsiyariyên di vî warî de, bangî hemû komeleyên xwe yên endam dike. Her komele divê di qada xebata xwe de ji bo bicîhanîna van berpiriyariyên ku menfaeta giştî ya gelê Kurd elaqadar dike, çalakiyan li dar bixe û têkeve nava danûstendinên pêwîst.

**Helwesta Parlamentoya Ewrûpayê:**

## Otonomî ji bo Kurdan!

Piştî rakirina îmunîteta 7 parlementerên Kurd, ku şeş ji wan ji Partiya Demokrasiyê ( DEP ) in, Parlamentoya Ewropayê di roja 9'ê adarê de di civîna xwe ya li bajarê Strasburgê de, bi 212 hember 3 rayan biryara otonomiyê ji bo çareserkirina Pirsa Kurd a li Tirkiyê girt. Her di vê civînê de li ser Pirsa Kurd biryarek bi 9 xalan hate wergirtin. Em li jêr tevayiya biryarê çapdikin.

Parlamentoya Ewrûpayê :

1 - Helwêsta Tirkiyê, ya ku zerar dide demokrasiya pluralîst protesto dike û daxwaza serbestkirina parlamenterên hatine girtin dike.

2 - Helwêsta Tirkiyê, ya li dij parlamenterên ku bi awayek demokratîk hatine hilbijartin û sucê wan tenê parastina mafên gelê Kurd e ku di bin tadeyên giran de ye, protesto dike.

3 - Bala Tirkiyê dikşîne ser, ku siyaseta tadeyê û qedexekirina nîşandana dîtinê ya parlementerên ku ji aliyê gelê başûrê rojhilat ve hatine hilbijartin, ku tenê piştgiriya PKK li Tirkiyê di nav kêmaniyan de xurttir dike.

4 - Ji hukimeta Tirk daxwaz dike, ku mafê otonomiyê ji bo gelê Kurd li Tirkiyê nas bike.

5 - Ji Konsey û Komîsyona Ewrûpayê daxwaz dike, da hemû îmkanên xwe bikar bînin û tadeyê li ser Tirkiyê bikin, ji bo ku îmunîteta parlementeran li wan bête vegerandin û mafên qanunî yên van parlementerên binavkirî dîsa ji bo wan bêne naskirin.

6 - Ji Konsey û Komîsyona Ewrûpa daxwaz dike, ku bangewazekê beramberê Tirkiyê derbixin û daxwazê ji Tirkiyê bikin, da girêdayî wan peymanên mafên mirovan be, ku bi xwe îmzekiriye.

7 - Biryara xwe ya rêkirina heyetek parlementer, ji bo çavnêriya hilbijartinên heremî nu dike.

8 - Nîşan dike, ku ger bernamzetên partiyên demokratîk di bin rewşek dijwar de û di bin tadeyekê ji alî tîmen taybetî ve bikevin hilbijartinan de, dê berhemên hilbijartinan bi şik bibîne.

9 - Serokê Parlemenê Ewrûpayê erkedar dike, ku vê biryarê bighîne Konseya Ewropayê, Hukimet û Parlemenê Tirkiyê.

# NEWROZ PÎROZ BE!

Newroza 94-an dîsa ji aliyê Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd hate pîroz kirin

Di Newrozê de şahiyek xurt bi gelek hunermendên Kurd beşdar bûn. (Tahsin Taha, Nasir Rezazi, Feqiyê Teyran Fouad Ahmed û Seîd Yusuf)

Her weha gelek axaftin jî hat, axaftinên ku hatin kirin li ser navê FKKS. Ahmed Karamus li ser navê biroya hukumeta Kurdistana Başûr Arie Reza, Komîta Swêdî, Serok Ingela Mårtensson, cîgirê serok Berith Eriksson û Samî A.Rahman endamê konseya Tevgera Rizgarixwazê Kurdistana Başûr bû.

Di Newrozê de li gel zarok û mezinan bi qandî 3000 kes beşdar bû. Program di 17.300 dest pê kir û 12.00-an de dawî hat.

BERBANG
Organa Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê

*Xwedî:*
VildanTanrikulu

*Berpisiyar:*
Heme Kerîm

*Redaksiyon:*
Mustafa Aydogan
Cemal Batun
Behroz Kurd Ehmedî

*Destê Hevkaran:*
Hemîd Kiliçarslan
Sidqî Hirorî
Nasir Sinan
Dara Rauf

*Karû Teknîkî*
Dylan Dersim
N. Kirîv
Bubê Eser

*Navnîşan*
FKKS-Berbang
Box:
490 90
100 28 Stockholm
Tel: 08-652 85 85
Fax: 08-650 21 20
Postgiro: 64 38 80-8

Federasyona komelên Kurdistanê li Swêdê di roja 6.6.1981'an de hatiye damezrandin.

Hejmarî Yekemî Berbang di meha 7'an ya 1982'an de belavbûye.

# CİVİNA Bİ "INVANDRARVERKET" RE

Komîteya Penaberan ya Federasyona Komeleyên Kurdîstanê li Swêdê di van mehên bûhurî de li ser pirsên penaberên kurd yen curbecur bi dezgehên swêdî re çend civîn pêk anî.

Berpirsiyarên Komîta Penaberan di van cîvînan de (Komîsyona Biyaniyan,Wezareta Biyanîyan, Daîreya Giştî ya Karûbarên Biyaniyan) hewl da ku wan li ser rewşa Kurdîstanê ya nuh agahdar bikin û li ser biryarên negatîv ku ji bo penaberên Kurd tên dayîn, rawestîn. Me gelek belge û nivîsên ku li ser rewşa Kurdîstanê hatibûn nivisandin, pêşkêşî wan kir û me di vî warî de raporek hazir kir. Me di vê raporê de li ser pêvajoya bîryardayînê, bîr û raya xwe pêşkêşî wan kir. Me rewşa 5 penaberên kurd yên biryarên nagatîv ji wan re hatîbûn, bi niviskî pêşkeşî wan kir.

### CİVÎNA Bİ BERİTH ROLLÉN RE

Komîteya Penaberan di yekê meha Adarê de li Norköpingê bi serokê SIV-ê(Daîreya Giştî ya Karûbarên Biyaniyan) re civînek pêk anî. Di civînê de ji Federasyona Komeleyên Kurdîstanê li Swêdê Ahmet Karamuz, Hesen Mîzgîn û Husamettin Aslan û ji invandrarverket jî Berith Rollên, Barbro û Sonja Nordström amade bûn.

Komîteya Penaberan piştî agahdariyên fireh yên li ser xebat û struktura Federasyona Komeleyên Kurdîstanê li Swêdê, li ser van pirsen girîng rawestiyan:

### 2- PİRSA PAŞ VE VERGİRTİNA PASAPORTEN "RESEDOKUMENT"

Di van mehên dawî de ji çend kurden ku çûbûn Kurdîstana Başûr û paş de zîvîrî bûn re, ji terefê SIV-ê biryarên ku pasaportên wan yên resedokument dê ji wan paş de bê stendin, hatîbû şandin.

Komîteyê li ser van biryaran rawestiya û bîr û raya Federasyonê ya di vî warî de, pêşkêşî wan kir û ji wan daxwaza rastkirina van bîryarên ne di cîh de hat kirin.

Komîteyê diyar kir ku gelek Kurd dixwazin herin Kurdîstana Başûr zîyaret bikin û piranîya wan jî dixwazin şertên paş de vegerê hazir bikin. Ev jî tiştekî baş û rast e.

Di vê pirsê de SIV-ê jî qebul kir ku ev biryarên hatîne dayîn, biryarin ne di cîh de ne û hejmara van biryaran jî ne gelek in. Wan diyar kir kû ji nuha û pê ve, ew kurdên ku diçin û şertên bi temamî paşdevegerê hazir dikin, bila bê tirs herin, ji nuha û pê ve biryarên paşdewergirtîna pasaportên resedokument dê neyên girtin.

### 2- PİRSA KURDÊN FEYLÎ

Pirseke giring jî pirsa Kurdên Feyliyên ku ji Îranê tên û "Învandrarverket" dixwaze bîryarên negatîv bigre û wan paş de bişînin Iranê bû.

Nûnerên Komîteya Penaberan li ser rewşa wan bi dûr û dirêjî agahdarî da û ji bo wan diyar kir ku ji bo Kurdên ku ji terefê Saddam ve bi zorê ji ser axa xwe hatine koçkirin, tu îmkan û şertê vegera Kurdîstana Başûr nînin û li Îranê jî di bin zilm û zordarîya rejima Îranê de ne. Komîteyê ji ber vê yekê daxwaz kir ku divê "SIV" rewşa wan bide ber çavan û li gor rewşa wan ya dijwar biryaran bigre.

### 3- PİRSA PENABERÊN KURDÎSTANA BAKÛR

Pirseke din jî pirsa penaberên ku ji Kurdîstana Bakûr tên bû. Nûnerên Federasyonê li ser rewşa nuh ya Kurdîstana Bakûr agahdarî da û li ser rewşa wan kesên ku SIV û UN(Komîsyona Karûbarên Biyaniyan) di derheqa wan de biryarên nagatîv dane rawestiyan. Daxwaza Komîteyê ew bû ku divê SIV di prosesa biryardayînê de rewşa nuh ya Kurdîstana Bakûr bide ber çavan û ji bo wan kesên ku biryara dawî ji wan re hatîye şandin, îmkana muracaateke nuh bide.

### 5- PİRSA PENABERÊN KURD YÊN KU Jİ BALTÎKUM TÊN

Komîteyê pirsa Kurdên ku ji Baltîkum tên Swêdê jî anî rojevê. Wek tê zanîn ev pirs di van rojên dawîn de gelek aktuell e. Gelek kesên din jî li ser navê Kurdan tên; bo numûne, Afganî, Pakîstanî, Ereb û Bangladeşî, lê di rojname û xeberên televizyon û radyoyan de hemû li ser navê Kurdan tê hesabkirin.

Invandrarverket dixwaze heyetekê bişîne Baltîkum û rewşa wê derê di cih de bibîne. Komîteyê ji bo wan diyar kir ku Federasyona me ji bo hevkariyeke di vî warî de, amade ye.

### 5- Lİ SER XEBAT Û PRENSÎPÊN XEBATA KOMÎTE YA PENABERAN AGAHDARÎ

Nûnerên Federasyonê li ser xebata Komîteya Penaberan agahdariyên fireh dan û behsa prensîpên xebatê kirin. Di civînê de li ser name û belgeyên ku ji bo penaberên Kurd tê nivîsandin jî hat rawestandin. Nûneran diyar kirin ku Federasyon bê referens tu belge û nameyan nanivîsîne. Ji bo vê yekê jî divê SIV van name û belgeyên ku ji terefê Federasyonê tên nivîsandin, bide ber çavan. Nûneran xwest ku SIV ji bo wan diyar bike bê Komîteya Penaberan ya Federasyona Komeleyên Kurdîstanê li Swêdê li ser referensên xelet name nivisandiye, an na. Nûneran ji bo di pêşerojê de xeletiyên weha neyên kirin, ji SIV-ê daxwaza alîkarî û agahdariya di vî warî de kirin.

## AGAHDARIYA JI BO PRESSE

Parlamentoya Tirkiyeyê di 02.03.1994-an de biryara ji ortêrakirina immuniteta 6 parlamenterên Kurd da. Herşêş parlamenter endamên Partiya Demokrasiyê(DEP) bûn û ji bo bidestxistina huwiyeta gelê kurd û mafên mirovî dixebitîn.

Piştî vê biryarê, polîsan seroê Partiya Demokrasiyê Hati Dicle û parlamenterê bajarê şirnexê Ohan Dogan girtin û ew birin cîhekî nediyar.

Li Parlamentoya Tirkiyeyê 17 parlamenterên Partiya Demokrasiyê hene. Partiya Demokrasiyê dê beşdarî hilbijatinên belediyeyan yên ku di 27.03.1994-an de çêbibin, bibûya. Lê di van demên dawî dePartiya Demokrasiyê bû hedefa hêzên ewleyî, kontr-gerîlla û hêzên taybetî yên dewleta Tirkiyeyê.

Bînaya navenda partiya Demokrasiyê hat bombekirinû xerakirin. Di vê êrîşê de yek şehîd ket û 17 kes jî birîndar bûn. Hema hema hemû berendamên ku Partiya Demokrasiyê ji bo seroktiya belediyeyan dabû diyarkirin,, hatin girtin û di îşkencexaneyan re derbas bûn. Gelek ji wan hîn jî di girtîgehan de ne.

Ordiya Tirkiyeyê bi hukûmeta nuha re, li dijî gelê Kurd şer îlan kiriye. Ne ordiya Tirkiyeyê û ne jî Hukûmeta wê tehamulî lênerînên cuda nakin û nemaze tehamulî wan kesên ku doza gelê Kurd tîne zimên nakin.

Parlamenterên ku immunîteta wan hatn rakirin, dê li gor maddeya 125 ya Qanûna Cezayê bên dadgehkirin. Ev jî tê maneya dardakirinê.

Tirkiye peymana Konseya Ewrûpayê, YN, Peymana Parîsê û hwd îmze kiriye. Di van peymanan de azadiya fikrî tê qebûlkirin. Li gor wan divê mirov li hember azadiya fikrî û mafên miovî rêzdariyê nîşan bide. Di warê pirsa Kurdî de, tu rêzdariya dewleta Tirkiyeyê li hember van peymanan tuneye.

Ev encamên şerekî giştî yê ku dewleta Tirkiyeyê li dij Kurdan îlan kiriye.

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê(FKKS), biryar Parlamentoya Tirkiyeyê bi tundî protesto dike û dide diyarkirin ku divê ev biryar paş de bê stendin.

Em ji Parlamento, Hukûmet, hemû partiyên siyasî û rêxistinên demokratîk yên Swêdê daxwaz dikin ku divê ew li dij vê biryarê derkevin û ji Tirkiyeyê hem daxwaza paşdeayina immunîteta parlamenteran bike û hem jî daxwaza hurmetgirtina peymanên ku Tirkiyeyê bi xwe îmze kiriye, bikin.

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, ji bo Kudistan nebe Lubnaneke nuh an jî Bosna-Hersekek nuh û ji bo di vî warî de em dereng nemînin, bangî Hukûmeta Swêdê û YN dikin ku divê ew pirsa Kurdan bibin platformên navneteweyî.

Li ser FKKS
Ahmed Karamus
Cîgirê serok
Stockholm,04.03.94

## Federasyona Komeleyên Kurdistanê û Hêzên siyasî civiyan

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li swêdê di 11.03.1994-an de li lokala Federasyonê, bi nûnerên hemû hêzên siyasî yên Bakurê Kurdistanê re ji bo hevkariya di warê çalakiyên li di Tirkiyeyê de, civînek pêk anî. Ji dervayî PKK, hemû rêxistin û partiyên Bakurê Kurdistanê nûnerên xwe şandin. Federasyonê di civînê de daxwaza hevkariyê xwe ya pêşkêş kir û xwest di vî warî de raya hêzên siyasî wergire. Nûnerên hêzên siyasî ev daxwaz bi awakî pozîtîv nirxandin. Piştî civînê bi du rojan jî ji bo koordînasyona di vî warî de, Federasyonê û hêzên siyasî gihaşt encamekê. Ji nuha û pê ve çalakiyên ku di hundurê meha Adarê de li dij Tirkiyeyê bê amadekirin, dê bi koordînasyona herdu aliyan be.

## YEKÎTIYA CIWANÊN KURD

### Kongreya xwe ya 7-em civand

YCK di 12.03.1994-an de li "Kista trfäff"ê kongreya xwe ya 7-em civand. Ji seksiyonên ciwanên komeleyên endamên Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê 62 nûner beşdarîû kongreyê bûn. Konger di saet 12.00-an de dest bi xebatên xwe kir û di saet 18.00-an de qediya. Di kongreyê de, li ser navê Federasyonê û YJK axaftin hatin kirin. Kongreya 7-em ji bo YCK destûreke nuh qebûl kir. Rapora xebatê, ya malî û ya Komîteya Çavdêr di kongreyê de bi nivîskî hatin belavkirin. Piştî munaqeşeyên di vî warî de organên sala derbasbûyî ji aliyê kongreyê ve hatin pesinkirin.

Kongreyê ji bo Komîteya Karger û Komîteya Çavdêr ev kes hilbijartin:

Komîteya Karger:

Esîl: 1- Atiye Battê, 2- Alan Dîlan, 3-Şevder Cizîrî, 4- Ako Nejmeddîn, 5- Şaho Xizirî, 6- Halo Bêkes, 7- Çalak

Cîgir: 1- Lokman Demîr, 2- Rojda Çelîker, 3- Lokman A.

Komîteya Çavdêr:

Esîl: 1- Sîamand Xizirî, 2- Xurşîd, 3- Huseyin

Cîgir: Dara Bana

YCK piştî kongreyê ji bo nûnerên kongreyê di bin berpirsiyartiya Dara Bana de, şeveke şahiyê amade kir. Ji dervayî nûneran, hinek mêvan jî beşdarî şeva YCK bûn.

## FEDERASYON JI DEP'RE NAME ŞAND

*JI MECLISA PARTIYA DEMOKRASIYE RE*

*Federasyona Komeleyen Kurdistanê pê agahdar e ku immuniteta parlamenterên partiya we hatiye rakirin û serokê Partiyê Hatîp Dîcle û parlamenterê bajarê Şirnaxê Orhan Dogan li ber deriyê parlamentoya Tirkiyeyê ji aliyê polîsan ve hatinin girtin.*

*Dostên hêja,*

*Em hem êriş, girtin û kûştinên ku Partiya we rû bi rû dibin û hem jî biryara rakirina immunîteta parlamenterên we û girtina wan bi nefreteke mezin protesto dikin û ji bo we piştgiriya xwe diyar dikin.*

*Ev helwest û biryara Parlamentoya Tirkiyeyê dide diyarkirin ku bê li Tirkiyêyê çiqas demokrasî heye. Pir eşkere ye ku Parlamentoya Tirkiyeyê ev biryar li gor emrê Konseya Ewleyî ya Neteweyî stendiye. Ev biryar perçeyekî şerê ji dijî gelê Kurd tê meşandin e.*

*Ev biryar li dijî peymanên Konseya Ewrûpayê ye. Dewleta Tirkiyeyê, peymanên ku îmza wê jî li bin heye, îhlal dike.*

*Em Federasyona Komeleyên Kurdistanê Li Swêdê dê li gor îmkanên xwe vê reftariya li dij demokrasî û mafên mirovî bighîne raya giştî ya Ewrûpayê.*

*Em piştgiriya xwe dîsa dide diyar kirin û di têkoşîna we ya demokrasiyê de serkeftinê dixwazin.*

Li ser navê Komîteya Karger ya FKKS
Ahmed Karamûs
Cîgirê Serok

## HEVDÎTIN LI PARLEMANÊ SWÊD

Girêdayî kampanya ya ku li dijî Tirkiyê destpêkiriye, serkê Federasyonê Vildan Tanrikulu, sekreter Mistefa Aydogan û berpisiyarê Komîteya pîwendiyên derve Cemal Batun, hevdîtinek li Parlemanê Swêd, bi Parlementera Partiya Çep Berith Eriksson re pêkanîn.

Di hevdîtinê de, li ser terora dewleta Tirk a ku roj bi roj hemberê gelê Kurd zêdetir dibe, girtina rojnamevan û kesên demokrata ên ku pirsa Kured tînin rojevê, komkirin û qedexekirina rojname û kovarên Kurdî, herweha helbijartinên heremî yên li Tirkiyê hate rawestandin.

Berith Ericksson diyarkir ku li hember kirinên hov ên dewleta Tirk hember gelê Kurd, bi gelek parlementerên din re misionek (pêşniyarek) ji bobiyraê dibin Palemanê Swêd, ku terora Tirkiyê bê protesokirin û swêd pirsa Kurd bibe platformên navneteweyî.

### HEVDÎTINEK JÎ BI INGELA MÅRTENSSON RE

Di roja 15-ê adarê de, li Parlamentoya Swêd cigirê serokê Federasyonê Ahmed Karamus, Sekreter Mistefa Aydoagn û berpirsê pîwendiyên derve Cemal Batun, li gel parlementera Folkpartiet û seroka Komîteya Swêdî ji bo mafên mirovî yên Kurdan Ingela Mårtensson re hevdîtinek pêk anîn.

Wek tê zanîn sitî Mårtensson di deam girtina Parlementerên DEP de li Tirkiyê bû û li wir li ser pirsa Kurd lêgerînên wê pêk hatin.

Di civînê de berpirsiyarên Federasyonê, rewşa Kurdistanê ya îroyîn anîne zimên û daxwazên xwe pêşkeşî sitî Mårtensson kirin.

Li gor agahdariya ku Mårtensson da, ew dê li ser pirsa Kurd çend raporan pêşkêşî wezîra derve, dezgehên eleqedar û civîna parlementerên navnetewî li 19-ê adarê li Parisê bike.

Cemal Batun
Berpisyarê Komîteya pêwendiyên derve

## YJK 8'ê ADAR'ê PÎROZ KIR

Xuşkên hêja!

Ev sala duyem e ku em, jinên Kurdistanê li Swêdê di bin baskê Yekîtiya Jinên Kurdistanê de 8-ê Adarê, roja jinan ya navnetewî pîroz dikin.

Em pir kêfxweş in ku bi awayekî fireh û bi hêz xebatê bikin. Bêguman avakirina YJK-ê gava yekem bû. Weşandina kovara "JIN" ku di civatê de dengê jinên Kurd dide xuyanîkirin, gava duyem e. Her weha di Komîteya 8-ê Adarê de û di nav jinên biyanî û Swêdiyan de, temsîlkirina me ji bo jinên Kurd serfiraziyek bû. Em hêvîdar in ku em dê di rojên pêş de gavên girîngtir û bi hêztir bavêjin. Em ji bo jiyaneke azad û wekheviya jin û mêran, dengê xwe bilind dikin.

Xuşkno!

8-ê Adarê ji bo hemû jinên cîhanê rojeke giranbuha ye. Lê mixabin ku para me jinên kurd di vê şahiyê de pir hindik e. Îro li Kurdistanê şerekî girîng heye û ev şer miletê kurd bi tevayî daye ber xwe. Bi sedan jinên Kurd di zîndanên dijmin de di berxwe de didin û bi hezaran keç û jinên Kurdan beşdarî têkoşîna gelê xwe dibin. Îro pirsa neteweyî ketiye pêşiya me, barê me girantir bûye.

Em wek YJK 8-ê Adarê pîroz dikin û di vê rojê de banga piştgiriya gelê xwe bilind dikin û zordariya dijminên xwe bi tundî protesto dikin.

Xuşkno

Dîroka Kurdistanê daye xuyakirin ku bi hezaran jinên Kurd ji bo rizgariya gelê xwe bûne canfîda. Mînak bi hezaran in: Leya Qasim, Zekiye Alkan, Rahşan Demirel û hwd.

Di rêya van şehîdan de, silav ji hemû şehîdên Kurdistanê re.

Silav ji bo jinên têkoşer û qehreman yên ku ji bo rizgariya jinan canfîdan bûn e.

Em wek YJK roja 8-ê Adarê, cejna jinan ya navneteweyî ya hemû jinên cihanê pîroz dikin. Her weha em cejna hemû jinên Kurdistanê; çi li mal, çi li serê çiyan û çi di girtîgehan de be, bi dil û can pîroz dikin.

**Yekîtiya Jinên Kurdistanê Li Swêdê**

## AGADARÎ JI BO KOMELÊN ENDAM!

Em wek komîte amadene ku, ji bo pirsên we yên ku di jîyana komelayetî de bi taybetî di beşa xebatên bi Swêdî de derdikevin holê, li gor qasî îmkan ûşertên me hebin alîkar bibin.

Em dikarin ji hin pirsên we re bi rêya namê yan ji telefonê jî bersîv bidin.

Ger daxwaz hebe em dikarin komelên ku nêzê Stockholmê ne zîyaret bikin.

Em dikarin li lokala Fedarasyonê di wexta tesbîtkirî de jî, di pirsên komelayetî de ji we re alîkar bibin.

Hûn dikarinnamê ji komîta me re bişînin an jî telefona Federasyonê bikin, nav û hejmarên telefonên xwe deynîn, dê em li we bigerin.


Serkeftin ji bo hemû komelên Kurdistanê re.

**Çerçeva Xebata Komîteya Perwerde**

- Ji bo komelan babetên jîyana komelaytetî de xebatên hîndekariyê pêk anîn wek li ser çêkirina projeyan, nivîsandina protokolên civîn û kongreyan, amadekirina qursan, nivîsandina destûran, agahdarî li ser struktura Federasyonê û hwd.
- Agahdariyên Swêdî li ser qanun û pirsên civakî yagirîng û pêwîst ku civata kurd li Swêdê elaqedar dike bi zarawayên kurmancî û swêdî belav bike.
.Li ser pirsên civakî ya kurdên ku li Swêdê ne; agahdariya naznistiyê çêke. Semîner, panel, konferans, qurs amade bike, agahdariyê belav bike.

*Komîteya Perwerde*

## X A Ç E P I R S



**Çepûrast:**

1- Navekî yekitiya rexistinan. 2- a) Dudilî. b) Daçekek ji bo lezê, acelekirinê. 3- a) Şop. b) Mezinê mizgeftê. c) Pronavekî pirrhejmar. 4- a) Dengvedan b) Genimê hêrayî. 5- Pirrpeyvê bê rê. 6- Baxcê bihiştê. 7- Nalinalek. 8- a) Yê din(berevajî). b) Sênî, firax. 9- Rewşen. 10- a) Piştî rojava. b) Navê rojekê.

**Serejêr:**

1- a) Wezîr, şahyar. b) Ne nêr. 2- Erê pê dan gotin, razîbûn. 3- a) Dayik. b) Navê êl û herêmekê li Bakurê Kurdistanê. 4- a) Bere(bi Kurmanciya xwarê). b) Bajarê Kurdistanê. 5- a) Hizir, fikir, navê êl û çiyayekî navdar yê Kurdistanê. b) Mêrê bizinê. 6- Hûr hêrayî. 7- a) Pêlava pez û dewaran b) Zimanekî Samî 8- a)Zikê mezin. b) Bawerî pê tê. 9- a) Mezel. b) Pûşê hûrkirî. 10- a) Berevajiya "bimije". b) Daçeka neyîniyê.

www.arsivakurdi.org

## Helwestê Rêxistinên Siyasî yên Kurdî

Pistî rakirina îmunîteta şeş parlementerên Partiya Demokrasiyê (DEP) ahmed Turk, Hatip Dicle, Sirri Sakik, Orhan Dogan, Leyla Zana, Selim Sadak û parlementerî serbixwe yê Kurd Mahmud Alinak ji bal Meclisa Tirkiyê ve, gelek hukumet, serokwezîr û serokaomarên dewletên Ewropayî bi tundî protestoyên xwe heberê Turkiyê kirin. Di roja 9-ê adarê de ji alîkar-serokê Parlemenê Ewropa li ser vê pirsê hevdîtin li gel berpirsiyarên hikumeta Tirk re pêkanîn.

Herweha li gor agahdarî û faksên ketine destê me. Serokatiya Giştî ya Hevgirtin-PDK, Partiya Sosyalist a Kurdistanê û Yekbûn jî bi tundî vê kirina Meclisa Tirkiyê hemberê parlementerên Kurd protesto dikin.

Di van daxwuyaniyan de, bi kurtî weha tê gotin:

**Hevgirtin-PDK,Serokatiya Giştî:**

"....Rakirina îmunîteta parlementerên DEP, derbeyek li demokrasiyê, sostaniya gelê Krud û Tirk û aştiyê ye. Ev biryar ji bal generalan ve hatiye girtin. Siha general Gures kete ser Parlemenê Tirk. Vê biryarê rêyên aştî û demokratik zehmet kirin. Ev biryar di demek herî kurt de divê bipaşve bête girtin.

**Partiya Sosyalist a Kurdistanê:**

... Partiya Sosyalist a Kurdistanê, rakirina îmunîteta şeş parlementerên DEP, a parlementyerê kevn ê DEP Mahmut Alinak û ya parlementerê serbixwe ye Istanbolê Hasan Mezarci protesto dike, van kirinên ku li dijî qanunê, huquq û demokrasiyê ne, rûreş dike...

**Yekbûn** : ...Partiya me, rakirina ımunıteta 6 parlementerên DEP'ê, parlementerê serbixwe yê Şirnexê û parlementerê İstanbolê yê serbixwe ku dıtina xwe li ser Kemalızmê gotibû, protesto dike. Bangı hemû hêzên neteweyı demokratik, her kesê ku li mafên mirovı, demokrasi û azadiyê ne dike, ku li hemberê êrişên terorist ê dewleta Tirk derkevin. Bi parlementeran re piştgiriya xwe binin zimên.

Li Swêdê jı hemû hêzên Bakûrê Kurdistanê bi hevûdû re Daxuyaniyek çapemeni û bangek imzekirinê ji bo Serokê Parlemenê Tirkiyê Husammedin Cindoruk re, ji bo imzekirinê ji bo xelkê Swêdê vekirin. Di daxuyaniya ku ji bal Hevgirtin - PDK, Kawa, PKK, PRK ( Rizgari ), PRNK, PSK, RNK - KUK, Têkoşina Sosyalist, TSK, Yekbûn komiteyên Swêdê ve hatiye imzakirin, bi kurti weha tê gotin.

DAXUYANIYA ÇAPEMENÎ

Îrîşên li ser "DEP" (partiya Demokrasî) ya ku di Gulana 1993-an de hat ava kirin û di parlamentohê de xwedî 16 endamên Kurd e, dom dikin.

Di 2-yê Adarê de umînîteta parlementerî ya parlamenterên PD,yê Ahmet Turk, Leyla Zana, Hatip Dicle, Sirri Sakik, Orhan Dogan, Selim Sadak û ya parlamenterî serbixwe Mahmut Alinak bi erêkirina parlamentoyê hat rakirin.

Di esasê xwe de "MGK" ê (Komisyaona Ewlehiya Netewî) bi mehan berê, ev biryar dabû. Tev hêzên resmî û nihênî yên dewletê bi mehan kampanyayên antî-PD û antî-Kurd li dar xistibûn. Heta niha parlamenterek ûhin rêvebir jî tgê de ji 70 yê zêdetir endamên PD yê hatin kuştin. Serokê berê yê PD,yê hat girtin. Bi hezaran endam û rêvebir ketin bin darê îşkencê, hatin girtin. Ji 20-î zêdetir qeza û wilayetan avakhiyên PD-yê hatin bombe kirin. Sekreterê Giştî Murat Bozlak hate birîndarkirin. Hêzên xuya û ên tarî yên dewletê, xebata PD ya ji bo hatina aştiyê û bi hemû dezgehên xwe ve bicihbûna demokrasiyê, terorîze kirin.

........

Bi bilindkirina dengê xwe piştgiriya daxwazên rewa yên gelê Kurd bikin.. 7.03.1994

## HILBIJARTINÊN HERÊMÎ LI TIRKIYÊ Û REWŞA BAKURÊ KURDISTANÊ

Dewleta Tirkiyê digel hemû pirsên polîtîk û astengiyên xwe yên aborî di 27-ê adarê (1994) de helbijartinên Herêmî pêk tîne.

Di van helbijartinan d serekên Belediyan û meclîsa wan, ednamên meclîsên Wîlayetan û Muxtarên gund û taran (taxan) de bêne helbijartin. Heta 26-ê heyva sibatê digel partiyên siyasî yên tikriyê bi navê "Kurda" partiya Demokrasiyê (DEP) ji beşdarî van helbjartinan dibû. Lê di Dawiya sibatê de (partiya Demokrasi) DEP-ê biryara vekişandinê ya ji Helbijartinên Herêmî pejirand û diyar kir ku ewleyî ya namzedên partiya me tune ye. Dewlet bi hemî karînên xwe li dijî partiya me kar dike. Mala parítya me ya Navendî li Ankara'yê bombekirin û endamekî me hate kuştin û 20 kes birîndar bûn, namzêden me yên ji bo seroketiya Belediyan têne girtinê. Em nikarin xwe pêşandanekê bikin û li herême bigerin ûhw. Ji ber van sedama ev helbijartin bi zexelî ye, raya gel bi durustî diyar nake. Em nikarin dildarên xwe bixapînin...

Biryara DEP-ê di rojeva Tirkiyê ya polîtîk de dengveda û texmînên ku heta nuha dihate kirin tevlihevkir. Emê li ser biryara DEP-ê wergirt (di cîh de bû an na) nekir ew karekî di ye. Encamên ve biryarê di rojeva Tirkikyê de hin pêlvedan di Medya tirkiyê de him dewlet û him partiyên siyasî li ser vê buyerê tiştên balkêş anîn zimên.

## ÎRAN BI ROBOTAN LI GUNDÊN KURDA DIDE.

Hêzên îranê yên rejîma Îslamî bi robotan êrîşî ser gundên kurda yên di tixubê Iraqê (Kurdistanê) de dike. Armanca êrîşên îranê bêtir werankirina xanumanên malbatên endamên Partiya Demoqrat a Kurdistana Iranê (KDPÎ) ye.

Di van êrîşan de tu peyv li ser kuştina însana belav nebû lê avayiyên gundan bi van êrîşan hatin hilweşandin.

KDPÎ di nav hêzên dijî rejima îslamî ya îranê de ji hêzên mezintirîn e. Gelek leşkergehên KDPÎ li Bakurê Iraqê nêzî tixubê Rojhilatê Kurdistanê bi cî bu ye û gelek malbatên Kurda di gundên wan deveran de cîwar bûne.

Nûçeya êrîşên hêzên Îranê yên Rejîma Islamî li ser gundên Kurdistanê ji ali yê Hevkariya Hêzên dijî Rejîma îslamiya îranê (INRC) ve ji Qibrisê ji Nicosia bi reya TT û AFP 940315 saet 08.16 de belav bû. Lê ji aliyê çavkaniyên srebixwe ve ta nuha nehatiye erêkirin. -Televizyona Swêdê Kanal 4-

## RUREŞIYA DEWLETA TIRK

Dewleta tirk di qada navhetewî de careka din hate rûreşkirin. Dadgeha mafê mirova ya li Ewrupayê bi biryara xwe sileyek li nav çavê dewleta Tirk da.

Di meha Çirriya paşin ya 1989-an de leşkerên tirka di serbendiya Cafer Teyyar Caglayangil de girtî ser gundê Cînebirê li herêma Botan li Cizirê. Bi emrê Cafer Teyyar, leşkeran digel her cureyên îşkencê heta pîsî "gû" jî bi gundiyan dane xwarin.

Gundiyên Cinebirê serli dadgeha tirka dan û gilî kirin. Dadgehên sivîl li ve dozê nenerin û gotin.

-Ev ne karê me ye. Divê hûn dozê li dadgeha (orfî îdarê), birêvebirina awarte yi vekin. Di wê demê de li dadgeha birêvêbirina awarte, bi tenê lêdana li gundiyan hatibû kirin, bibû babeta gilîkirinê.

Piştre li Dadgeha cezayê giran li Ankara yê 10 meh ceza li Cafer Teyyar Caglayangil birrî. Lê pisî bi gundiyan danxwarin ne da berçavan.

Gundiyên Cinêbirê bi vê yekê nehatin ser û doza xwe agotin. Bi riya parezerê (avuqatê) xwe Hasip Kaplan doza rêkirin Dadgeha mafê mirovî ya li Ewrupa yê... Di serlêdana Dadgehê de hate diyarkirin ku, pîsî bixwarindan bi mirova ji îşkenceyên herrî granê û divê kirdarên vê kiryarê bi cezayên hîn mezintir bêne cezakirin, û divê kirdarên vê kiryarê li gora qanûna cezaye ya Tirkî xala 243-ê ceza bixwara. Pêknehatina vî tiştî li dijî peymana mafê mirovan ya li Ewrupa yê xala 3.yem û berdewama wê ye.

Dewleta tirk piştî wê serlêdana xwest ku bi gundiyên Cînebirê li hev bê. Lê gundî bi wan re li hevnehatin û doza xwe ajotin. Konseya mafê mirovan ya li Ewropayê piştî lêkolin û lêvenerîne bawerkir ku tirkî gunehkar e. û (3.600.000.000) sê milyar û şesid milyon lîrayê tirkî ceza li dewleta tirk birrî ku ev pere bighên gundiyan. Dewleta tirkî wezareta karûbarên derve ji çar kesan re dayina nezikî (4) çar miljar cezayê pera qebûl kir.

Ev Cafer Teyyar Caglayangil ne Cafer Teyyarê yekem e ku bi kiryarên qirêj navê xwe bi kurda dide naskirin. Di sala 1916 heta Serhildana Sêx Seîdê nemir Cafer Teyyar paşa li herêma Elezîzê sereka Qolordiya 11-an bû Cafer Teyyarê berê ji di dadgehkirin û dardakirina Şêx Seîdê nemir û peşevayên serhildanê rolekê mezin lîstibû. Carxa felekê digere, tarix dubare dibe.

## Îran dîsa Başûrê Kurdistanê bombe kir

Dewleta Îranê di 11.03.1994-an de Geliyê Şawerê bombebaran kir. Gelek gundên dorhêla geliyê hatin xerakirin û rûniştevanên herêmê mecbûrî barkirinê man. Bi vê bombebaranê ve, çandiniyê gundiyan zerareke mezin dîtin. Ev ne cara yekem e ku Îran bi bahaneya ku hêzên Rojhilatê Kurdistanê li wê deverê ne, êrîş dibe ser Başûrê Kurdistanê. Lê mebesta rejîma Tahranê ne bi tenê êrîş birina ser hêzên welatparêzên Rojhilatê Kurdistanê ne, armanca van êrîşan herweha provakekirina ewleyiya Başûrê Kurdistanê û ji bo rawestandina pêvajoya pêşveçûnê û peydekirina astengiyan e.

**Serekê giştî yê Navenda Çanda Kurdi roja Navneteweyi Li Moskowayê Tajdin Biroyêv, ji 15-ê adarê (1994) virde di greva xwebirçîhiştinê de ye.**

Çanda Kurdi sedemên nannexwarina Tajdin Biroyêv weha diyar dike:

-Hukûmeta Rusyayê zordariya polîtîk i ser çanda kurdî û serekê giştî dike.

-Hukûmeta Rusya yê dixwezae 50 mihacirên Kurd ji Ofisa (Bûroya) Çanda Kurdî dûr bike. Ji sedî heftê %70 ji penahendeyên Kurd zarok in.

-Daxwazên Çanda Kurdî ya Navneteweyî li Moskowa ji greva xwe birqçîhiştina Biroyêv ev in.

-Polîtîka Hukumeta Rusyayê di derbarê pirsgirêka Kurda da bê guhertin.

-Kurdistan di qada navneteweyî de li gor daxwazên welatên pêşketî neyê bikaranîn.

-Hukumeta Rusya yê alîkariya mihacirên Kurd yên li Sovyetistana berê û rojhilata navîn bike.

www.arsivakurd.org

Li Kurdistanê li dijî du rojnamevanên Swêdî Sûîqast !

# Du rojnamevanên Swêdî ji mirinê filitîn

Du rojnamevanên Swêdî, Anders Blomdahl û Katarîna Bjärvall li Kurdistanê bûn hedefê sûîqastekê. Herdu rojnamevan li ser navê Komîteya Swêdî ya ji bo Mafên Mirovî yên Kurdan, li Başûrê Kurdistanê ji bo pêkanîna projeyekê dixebitîn û çûbûn Kurdistanê. Komîteya Swêdî li herêma Duhokê, bi alîkariya "SIDA"yê ji bo pêkanîna programeke laşsaxiyê ya berfireh dixebite. Rojnamevan li gundê Barbareşê ku nêzîkî sînorê Iraqê ye, mêvanê serokê Kontora Agahdariyê ya Başûrê Kurdistanê bûn. Bûyer gava ku rojnamevanên Swêdî di 13.03.1994-an de, ber bi Hewlêrê dizivirîn, diqewime. Bombeya ku di erebeya wan de hatibû bicîhkirin, piştî nîvsaet ajotinê ji nişka ve teqiya û nêviyê dawî yê erebeyê bi xwe re firand. Hinek kesên din jî di erebeyê de hebûn, lê li agahdariyên ku hatin stendin, hedefa êrîşê rojnamevanên dostên Kurdan bûn. Di vê êrîşê de Anders Blomdahl bi tundî birîndar bû; herdu guhên wî nema dibîhisin û ser çavên wî xerab birîn bûye. Katarîna ji vê sûîqastê, bê birîn filitiye. Lê hîn jî di bin tesîrên psîkolojîk yên vê hedîseyê de ye.

## Ingela Mårtensson li Tirkiyeyê bû

*Ingela Mårtensson piştî bûyerên dawiyê yên ku pirsa Kurd û Partiya Demokrasiyê kir xala yekem ya hem rojeva Tirkiyeyê û hem jî ya gelek platformên navneteweyî, bi delegasyoneke navneteweyî re çû Tirkiyeyê. Seroka Komîteya Swêdî ya ji bo Mafên Mirovî yên Kurdan û Parlamentera Partiya Gel ya Lîberalan Ingela Mårtensson di vê ziyareta xwe de bû şahidê gelek tiştên ku li gor wê nedihat xeyalkirin. Piştî vegerê tiştên ku Mårtensson digot û dinivîsandin, dida diyarkirin ku rewşa Kurdan ya li Tirkiyeyê û Kurdistanê tesîreke mezin lê kiribû. Di axaftinên Mårtensson de pêwistiya piştgirî û lêbixwedîderketineke xurttir dihat zimên. Mårtensson piştî vegerê, li ser daxwaza rojnamevanan, ji bo raya giştî ya Swêdê di derheqê rewşa Tirkiyeyê ev nivîsa hanê nivîsand. Em vê nivîsê mîna numûneyek ji piştgirî û lêbixwedîderketinên dostên Kurdan pêşkêşî xwendevanan dikin.*

Min di van demên dawî de, Kurdistana Tirkiyeyê û ya Iraqê gelekk caran ziyaret kir. Ez beriya nuha bi demekê(6/3-11/3) jî beşdarî delegasyona Federasyona Navneteweyî ya Mafên Mirovî bûm. Di vê delegasyonê de, ji dervayî min, awûqatekî Fransî û endamekî komîteyeke Parlamentoya Fransayê jî hebûn. Em raporek ku dê ji YN, UNESCO û Konseya Ewrûpayê re jî bête şandin, amade dikin.

Rewşa Tirkiyeyê ji her demê xerabtir e. Şîddet roj bi roj zêdetir dibe. Di nava PKK-ê û leşker, kontrgerilla û Hizbullah(mîna milekî "MIT"ê tê dîtin) de, şerekî hundur heye. Gelê Kurd qurbanê herî pêşîn yê vî şerî ye. Ji dervayî dardakirin û kuştinên bi nîzamî tên kirin, ta'deyeke mezin li ser gel heye.

Gund têne şewitandin û mirov mecbûrî barkirinê tê hiştin. Nufûsa bajarê Diyarbekirê di van sê salên dawiyê de, ji ber barkirina mecbûrî ya ji gundan, bi qasî milyonekê zêdetir bûye. Wekî din jî gelekan bar kirine û çûne bajarên mezin, Stenbûl, Ankara û Îzmîrê. Ta'de û kuştin li van bajaranan bi xwe jî heye. Min di 11.03.1994-an de Wezîrê Karûbarên Derve yê Tirkiyeyê ziyaret kir. Wî di wê ziyaretê de, ji min re got ku "gava em di 1991-ê de bûn hukûmet, me fahm kir ku problema terorîzmê bi Rojhilata Başûrê Tirkiyeyê ve ne sînor kiriye".

Ji sala 1984-an û vir de, li Tirkiyeyê cezayê îdamê tetbîq ne bûye, lê mirovên aktîv yên guman jê tê kirin( li gor Tirkan; separatîst) bêî dadgehkirinê têne kuştin. Mirov têne girtin û îşkencekirin. Ne tenê terorîstên guman jê tê kirin, lê herweha kesên ku ji an gumana ku piştgiriya PKK-ê tê kirin jî bi van tiştan re rû be rû dibin. Ji bo gelê Kurd û hinek Suryaniyên ku li wir mane, tu dewleteke huqûqê tuneye.

Li Kurdistanê, li 16 awûqatan dawe hatiye vekirin û mahkemeya wan dê di 21- Nîsanê de çêdibe. Ew 25 rojan çavgirtî di nezaretê de mabûn. Gava awûqateke jin nexwest binê hinek îtîrafên jê dihat xwestin, îmze bike, marûzî ta'deya cinsî maye. Doktor ji bo ku hin nexweş derman kirine, tên cezakirin û hinek jî hatin kuştin. Entellektuelên Kurdan di bin ta'de û zulmê de dijîn û têne kuştin. Min lêkolînerekî kulturê dît. Ji ber ku wî di derheqê stranên Kurdî de pirtûkek nivîsandiye, ji bo wî cezayê hefsê û cezayê perakî pirr tê xwestin. Numûneyên weha gelek in.

Rêxistina Efûyê sûcê li dij mafên mirovî têne kirin, roj bi roj rapor dike. Rêxistina Efûyê nuha di warê mirovên ji ber sedemên siyasî hatine wendakirin û kuştin de, dest bi kampanyayekê kiriye. Bo numûne; di Payizî de, li Kurdistanê parlamenterek hat kuştin. Di van salên dawî de, bi kêmanî 16 rrojnamevan hatin kuştin.

Di 27-ê Adarê de, li Tirkiyeyê hilbijartinên belediyeyan çêdibin. Rewş ewqas xerb e ku li Rojhilatê Başûrê Tirkiyeyê hilbijartineke demokratîk dê nikaribe pêk bê. Partiyeke Kurd (DEP) ji ber ku gelek berendamên wê hatin kuştin û lokalên partiyê hatin bombekirin, xwe ji hilbijartina vekişand. Min bi xwe lokala partiyê ya li Ankarayê ku beriya demekê hatibû bombekirin, ziyaret kir. Gava bombeya ku di asansorê de hatibû bicîhkirin teqiya, 40 kes li hundurê xênî de hebûn û ew kesê ku deriyê asansorê vekir, hat kuştin.

6 parlamenterên Partiya Demokrasiyê, piştî ku immunîteta wan ji wan hat stendin, hatin girtin. Ev hereketek ku li dij parlamenterîzmê ye. Reaksiyoneke navneteweyî ya pirr mezin peyde bû. 20 parlamenterên Swêdê ji ji Parlamentoya Tirkiyeyê re name şandin û ji serokç Parlamentoyê daxwaza paşdedayina immunîteta parlamenteran hat kirin.

Weha xuyaye ku li Tirkiyeyê rewş pirr xerb e. 21-ê Adarê sersala Kurdan e û piştî wê bi 6 rojan jî hilbijartin heye. Leşker hatine mobilîzekirin. Herkes di nava endîşeya ku şîddet dê hîn jî zêdetir bibe de ne. Gelek Kurd rewşa ku li Tirkiyeyê heye bi ya ku li Bosna re muqayese dike û ji ber wê meraq dikin û dibêjin; "Ma gelo li hember bûyerên ku li Tirkiyeyê diqewimin, civata navneteweyî ji bo çi reaksiyoneke mezintir nîşan nade".

Ingela Mårtensson

*Seroka Komîteya Swêdî ya ji bo Mfên Mirovî yên Kurdan*

*Parlamentera Partiya Gel ya Lîberalan*

## Nameya "Hevkariya ji bo Aşitiyê"

Hevkariya ji bo Aşitiyê(samarbete för Fred) bi munasebeta rakirina immunîteta parlamenterên Kurd û girtina wan, ji wezîra karûbarên Derve Margaretha af ugglas û wezîrê Mafên mirovî Alf Svensson re nameyeke vekirî şand. Em vê nameyê ji bo xwendevanên xwe li jêr diweşînin.

**Ji wezîra karûbarên Derve Margaretha af ugglas û wezîrê Mafên mirovî Alf Svensson re**

*Di derheqa girtina 7 parlamenterên Kurd de ye.*

Kirinên meqamên Tirkiyeyê yên van rojên dawiyê ku sê hefteyan beriya hilbijartinên belediyeyan hatin holê, me dixe nava endîşeyeke gelek mezin.

Wezîra Karûbarên Derve Margaretha af Ugglas di 21.10.1994-an de Ankara ziyaret kir û bû mêvana Hikmet Çetin û Serokkomar Suleyman Demirel. Ugglas di wê ziyaretê de da diyarkirin ku Tirkiye hem endamê Konferansa Ewleyî û Hevkariyê ya Ewûpayê ye û hem jî endamê Konseya Ewrûpayê ye û bi vê munasebetê di nava demokrasiyên ewrûpayê cîhê xwe digre. Ji ber vê yekê em bi tundî diçin ser pirsên ku bi mafên mirovî û yên bi mînorîteta Kurd ve girêdayî ne.

Hevkariya ji bo Aşitiyê, rêxistineke siyasî ya serbixwe ya piştgirî û aşitiyê ye û giraniya xebata xwe dide ser rêzdariya ji bo mafên mirovî.
Em bi wê axavtina ku wezîra Karûbarên Derve li Tirkiyeyê kir re ne.
Em hêvî dikin ku wezîra karûbarên Derve dê li gor wê axavtina xwe hereket bike.
Rewşa Tirkiyeyê ber bi teqandineke mezin diçe. Ev jî dibe sedema nestalbilîzebûna vê herêma dinyayê. Em meraq dikin, gelo wezîra karûbarên Derve difikire ku ji nû ve pêywendiyan bi hevalê xwe yê li Ankarayê re deyne, û beriya hilbijartinên ku dê 27.03.1994-an de çêbibin, reaksiyona raya giştî ya dinyayê pê re munaqeşe bike? Swêd di hundurê çarçoveya Konferansa Ewleyî û hevkariyê ya Ewrûpayê de divê însîyatîveke çawa bistîne û dikare çi bike? Gelo swêd dê ji bo nêrevaniya hilbijartinan, grûpeke serbixwe ya ku ji parlamenteran pêk tê bişîne an na?

Rewş ji ber van pirsên ku li jêr hatine nivîsandin pirr ciddî û bi xeter xuya dibe.
1- Hurmeta li hember mafên mirovî
2- Muameleya li hember gelê Kurd
3- Hurmeta li hember Qanûnên Bingehîn û qaîdeyên demokratîk
4- Talûkeya nestabilîzebûyina rojhilata Navîn

Em daxwaz dikin ku divê Hukûmeta Swêdê ji bo van parlamenteran, piştgiriya xwe bi awakî xurt nîşan bide.

Hevkariya ji bo Aşitiyê

**Anna Karin Olsen**
Serok

**Jan Fjellander**
endamê serkariyê

## Hefteya Çandî ya Kurdan

Li Swêdê, li Xwendegeha Bilind ya Gel ya "LO"yê hefteya çanda Kurdan tê amadekirin. Ev hefteya çandî di nava 11.04 û 17.04.1994-an de, ji aliyê "Tevgera Biratiyê (Broderskapsrörelsen)" ve tê organîzekirin. Di vê hefteyê de gelek çalakiyên cuda tên fikirandin, "Tevgera Biratiyê" ji beşdarbûna çalakiyan Federasyona Komeleyên Kurdistanê jî dawetî vê hefteyê kiriye. Federasyonêji bo beşdarbûneke xurt û bi rêkûpêk wezîfe da komîteya Çand û Hunerê. Li gor programa ku hate diyarkirin, hefte dê bi axavtina li ser dîroka Kurdan û rewşa îroyîn ve bê vekirin. Çalakiyên ku di vê hefteyê de têne fikirandin, ev in: 2-3 dengbêj û govendger; 2 helbestvan û artîstek; raxistineke hunerî ya ku ji tabloyên du hunermendan pêk tê ku navê yekî ji wan Madhat M Ali ye û li Swêdê rûdine; hunera zarokan û xwarina Kurdan hemû hefteyê heye û 2-3 kes ji bo vî karî hatine destnîşankirin. Ji dervayî van çalakiyên ku li jor hatin diyarkirin, dê gelek çalakîyên din jî bên kirin.

## نامەی "هاریکاری بۆ ئاشتی"

بە بۆنەی گرتن و هەڵاتنی چەند ئەندامی کوردی پەرلەمانی تورکیا

، "هاریکاری بۆ ئاشتی" نامەیەکی ئاوەڵای بۆ مارگاریتا ئاف ئوگلاس وەزیری کاروباری دەرەوەی سوید و ئالف سڤێنسۆن وەزیری مافی مرۆڤ ناردووە. دەقی نامەکە بەم چەشنەیە:

نامەیەکی ئاوەڵا بۆ مارگاریت ئاف ئوگلاس وەزیری کاروباری دەرەوەی سوید و

ئالف سڤێنسۆن وەزیری مافی مرۆڤ

سەبارەت بە گیرانی حەوت پەرلەمەتاری کورد لە تورکیا لە رێکەوتی ٢ -١٩٩٤/٣/٤دا.

ئێمە لە بەرانبەر ئەو رەوتی کاردانەوەی هەڵسوکەوتی ئۆرگانەکانی دەوڵەتی تورکیا سێ هەفتە بەر لە هەڵبژاردنی هەرێمی هەست بە نیگەرانییەکی گەورە دەکەین.

مارگاریتا ئاف ئوگلاس وەزیری کاروباری دەرەوەی سوید لە چاوپێکەوتنێک لە گەڵ هاوتای تورکی خۆی "حیکمەت جەتین" و سەرۆک کۆمار "سولێمان دەمیرەل"لە ٢١ی ئۆکتۆبەری ٩٣دا لە ئانکارادا، رایگەیاند کە تورکیا وەک ئەندامی کۆنفرانسی ئاسایشتی ئەورووپا(ESK) و شورای ئەورووپا، خۆی لەو دیموکراسییەی ئەورووپایە هەڵناوێرێ. "بۆیەش ئێمە لە مەڕ رێزگرتن بۆ مافی مرۆڤ و رەفتار لە بەرانبەر کەمایەتی کورددا، مەرجی بە هێزی بۆ دیاری دەکەین ."

هاریکاری بۆ ئاشتی وەک رێکخراوێکی سیاسی سەربەستی ئاشتی - هاریکاری بە پلەی سەرەکی تێکۆشان و وزەی خۆی بۆ داکۆکی لە مافی مرۆڤ تەرخان دەکا.

ئێمە پشتگیری لە گووتەکانی وەزیری کاروباری دەرەوەی سوید دەکەین.

ئێمە هیوادارین ئێستا وەزارەتی دەرەوەی سوید هەر بە گوێرەی وتەکانی پێشوویان بڕواننە مەسەلەکە.

هەلومەرجی ئێستای تورکیا بە خێرایی بەرەو تەقینەوەیەک دەڕوا کە دەتوانێ کار بکاتە سەر رەوتی ناوچەکە. ئێمە لامان پرسیارە کە داخوا ئێستا وەزیری کاروباری دەرەوەی سوید بەتەمایە دووبارە لە گەڵ هاوتای تورکی خۆی لە ئانکارا سەبارەت بەرەنگدانەوە و کاردانەوەی نێونەتەوەیی ئەو رووداوانەی بەر لە هەڵبژاردنی رۆژی ٢٧ مارس ٩٤ گفتوگۆ و باسیان لە گەڵدا بکا؟ کامە و چ هەڵوێستێک دەبێ سوید لە چوارچێوەی (ESK)دا بگرێ؟ داخوا سوید وەفدێکی غەیرە دەوڵەتی و پارلەمانی وەک چاودێر بۆ هەڵبژاردنی هەرێمی تورکیا دەنێرێ؟

بارودۆخەکە جیدییە و ئەم بوارانەوە دەگرێتەوە:

١. رێزگرتن لە مافی تایبەتی مرۆڤەکان.
٢. رەفتار لە گەڵ خەڵکی کورد.
٣. رێزگرتن لە یاسا بنچینەییەکان و دیموکراسی لە وڵاتدا.
٤. مەترسی بۆ بەرزبوونەوەی ناهێمنی لە رۆژهەڵاتی ناوەراست.

ئێمە داواکاری پشتگیری توند و بەهێزی دەوڵەتی کوردی پەرلەمان.

هاریکاری بۆ ئاشتی

## هەفتەی کولتووری کورد

هەفتەیەکی کولتووری لە ٤/١١ تا ٤/١٧ لە خوێندگەی باڵای گەلی (LO, folkhögskolan) لە لایەن بزووتنەوەی برایەتییەوە رێکخستراوە و فیدراسیۆنیش بۆ بەشداری لەم هەفتە کولتوورییەدا بانگهێشتێ کراوە. کۆمیتەی کولتوور و هونەری فیدراسیۆن ئەرکی رێکخستنی کارەکانی بە ئەستۆوە گرتووە. بەشداری دوو سێ گۆرانیبێژی کورد، دوو شاعیری کورد، پێشکەش کردنی بەرنامەی بەشی هونەری منداڵان، خواردنی کوردی، سیمینار لە سەر مێژوو و بارودۆخی ئێستاکەی کورد و کردنەوەی پێشەنگەی وێنەکێشی مەدحەت عەلی و ... بەشێکن لەو کەلالەیە.

## داخوا ئێمەی بیانی بۆمان هەیە بەشداری لە رێفراندۆمدا بکەین؟

پارتە سویدییەکان سەبارەت بە رۆژی رێفراندۆم بە یەک نەگەیشتن. سوید لە مێژە بۆ بوون بە ئەندامی "یەکێتیی ئەورووپا "Y.E" خەریکی پەیوەندی گرتن و گفتگۆیە. ئێستا پەیوەندییەکان لەم بوارەدا گەیشتوونەتە ئاستی بڕیاردان. بۆیەش سوید بەشداری ئەو رێفراندۆمە دەکا، لایەنە جیاوازەکانی کۆمەڵگای سویدی تا ئێستا راوێژیان لە گەڵ زۆر کەسی پسپۆر و شارەزا لەم بوارەدا کردووە و دەکەن، بەڵام بە گوێرەی ئاگاداری پەرلمانی سوید، لە مەڕ رۆژی هەڵبژاردنەکە سێ رای جیاواز هەیە: سەرۆکی پارتە سیاسییەکان پاش گفتوگۆ و دمەتەقەیەکی زۆر (سەرۆکی پارتی سەنتەرOlof Johnsson) ٦/١٨و، (سەرۆکی پارتی گەلی لیبراڵ، Bengt Westerberg) ٢٧ / و هەروەها ٢٧ / ٥ یان بۆ ئەو رۆژە پێشنیار کردووە.

لە کۆبوونەوەکاندا باسێکی زۆر لە سەر مافی پەنابەران و ئەو بیانییانەی هێشتا نەبوونەتە "هاووڵاتی سوید"ی لەو هەڵبژاردنەدا کرا. هەر چوار پارتی لە سەر ئەو باوەڕە بوون کە تەنیا سویدییەکان مافی بەشدارییان لەو رێفراندۆمەدا هەبێ. پاکانەکەشیان بۆ ئەو بۆچوونە ئەوە بوو کە ١- هەندێ وەک فینلەندییەکان بەم جۆرە لە دوو وڵاتی جیاواز لە مافی دەنگدانیان کەڵک وەردەگرن. ٢- مەسەلەی بڕیار بۆ ئەندامێتی لە یەکێتیی ئەورووپا پێوەندی بە یاسای بنچینەیی و مەسەلەی ئاسایشتی وڵاتەوە هەیە، بۆیەش تەنیا هاووڵاتیانی سوید دەبێ بۆیان هەبێ بەشداری ئەو رێفراندۆمە بن.

سوسیال دیموکرات و پارتی چەپ داواکار و لە سەر ئەو رایەن کە هەر وەک چۆن بیانییەکان بەشداری رێفراندۆمی وزەی ئەتۆمییان کرد، هەروەها ئەو کەسانەی ماوەی سێ ساڵ نیشتەجێی سوید بوون توانیان بەشداری هەڵبژاردنی شارەوانییەکان بن بەمجۆرە مافی ئەوەیان هەبێ کە بەشداری ئەم رێفراندۆمەش بکەن.

## چاوپێکەوتن لە گەڵ ئینگلا مورتینسوون!

لە رێکەوتی ١٩٩٤/٣/١٥ دا لە پەرلەمانی سویددا جێگیری سەرۆکی فیدراسیۆن ئەحمەد قەرەمووس، سکرتێر مستەفا ئایدۆغان و بەرپرسی کومیتەی دەرەوە جەمال باتوون لەگەڵ پەرلەمەنتاری "فۆلک پارتی" و سەرۆکی کومیتەی پارێزگاری لە مافی مرۆڤی کورد (ئینگلا مورتینسوون) چاوپێکەوتنێک پێک هات.

بۆ ئاگاداری مورتینسوون لە کاتی گیرانی پەرلەمەنتارەکانی پارتی (دیب) لە تورکیە بوو. ناوبراو زۆر چاوپێکەوتنی لەسەر مەسەلەی کورد لە تورکیەدا پێک هێنا لە کۆبونەوەکەدا بەرپرسیاری فیدراسیۆن باسی باری ئەمڕۆی کوردستانیەکان کرد وێرای گفتوگۆیەکی تێروتەسەڵ داخوازیەکانیان پێشکەش بە مورتیسوون کرد.

لەم پەیوەندی یەدا مورتیسوون نیازی وایە راپۆرتێک لەسەر کوردستان پێشکەش بە وەزارەتی دەرەوە بکات و ئاگاداری دەزگای تر بکات هەروەها مورتیسوون راپورتێک پێشکەش لەسەر مەسەلەی کوردستان بە کۆبونەوەی نیو نەتەوەیی پەرلەمانەکە دەکات.

## سامەکان داوا دەکەن ببن بە ئەندامی کۆنسەی وڵاتانی باکوور

بۆ جاری یەکەم لە ساڵی ١٩٩٣دا سامەکان هەڵبژادنی گشتی خۆیان کرد و پەرلەمانی خۆیان دروست کرد. ئیمرۆش سامەکان دەیانەوێ ببن بە ئەندامی کۆنسەی وڵاتانی باکوور. لەم مانگەدا لە ستۆکهۆڵم کۆبوونەوەیەکی کۆنسەی وڵاتانی باکوور دەکرێت و بۆ جاری یەکەمە سامەکان داوەتی کۆبوونەوەکە دەکرێن. لەمەڕ سامەکان کۆمسیۆنی، حقوقی کۆنسەیەکە وا دەڵێت: (بۆ سامەکان مافی چاودێری بەش دەکات).سامەکان بەوە رازی نابن و حەز دەکەن تێکەڵیان بە و وڵاتانی باکوور قوڵتر بێت و وڵاتانی باکوور سامەکان وەک خەڵکی باکوور دابنێن کە مافیان وەک مافی خەڵکی هەر وڵاتێکی باکوور. ئەندامی پەرلەمانی سامەکان لە سوید انکڤار ئۆهرێن دەڵێ: (ئێمە یەکێن لەو گەلانە کە هەری باکوورین. ئێمە پێش دروست بوونی وڵاتانی باکوور هەبووین و ئێستاش خاکی ئێمە لە نێو سێ وڵاتی باکوور دایە.

## شەریکەیەکی سویدی پرۆپاگەندەی نازیستی دەکا

بە گووتەی رۆژنامەی (ئافتۆن بلادێت) شریکەیەکی سویدی کە لە رێگەی پۆستەوە کەلوپەل دەفرۆشێت خەریکی پرۆپاگاندەی نازیستییە. ئەو شیرکەتە ناوی (Warior Publications)یە و وێنەی کەسان و هێما و ... نازیستی دەفرۆشێت. سەرۆکی ئەو شیرکەتە (Per Jönsson) دەڵێ کە مەبەستی ئەوان قازانج کردنە و ئەو شیرکەتە پێوەندی بە سیاسەتەوە نییە و پتر بەڵگەنامەی مێژوویی دەفرۆشن. لە کاتالۆگێکدا کە بڵاویان کردۆتەوە ئامانجی ئەو شیرکەتە بە باشی دەردەکەوێ. لەودا وێنەی (Reinhard Heydrich) و هێمای خاچی شکاو وئارەقکر بە وێنەی(SS) هەروەها وەسییەتنامەی هیتلەری تێدایە کە لە فیلمەکەی Martin Bormann & Leni Riefen-) (stahls وەرگیراوە و کورت کراوەتەوە.

## "Ronya Rövardotter"

## دەیەوێ ببێتە ئەندامی پەرلمانی سویدی

دە ساڵ لەمەوبەر کچێکی پانزە سالانە بە ناوی (رۆنیا) کە ناوی راستەقینەی (هانا زێتێربەری)یە لە فیلمێکی تەلەفزیۆنیدا بە ناوی(Ronya Rövardotter) بەشدار بوو و ناوبانگی دەرکرد. ئێستا "هانا" ٢١ سالانەیە و لە یۆتۆبۆری لە هەڵبژاردنی پارلمانی سویدا لە لایەن پارت چەپەوە کاندید کراوە. هانا پێشتر لە ناوچەی "تێنستا"دا دەژیا و خۆی دەڵێ کە مێهرەبانی بایەخدان بە مرۆڤ لە ناو خەڵکی ئەو شوێنەدا فێر بووە. ئەو یەکێ لەو کەسانەیە کە بە دەگمەن رێیان لە پارلمان دەکەوێ. هانا ئێستا بە چاکەتێکی چەرمی کە ئەستێرەیەکی سووری لێداوە هاتوچۆیە دەکا، بەڵام خۆی پێی وایە بە چوونە ناو پەرلەمانی ناچار دەبێ ئەو شێوە جل لەبەرکردنە بگۆڕێ.

## دژ بەYE کەمپی باکوور دروست بوو

رۆژ بە رۆژ موناقەشەکان دەربارەی ئەندامەتی لەYEدا دژوارتر دەبن. لەم بارەوە هاووڵاتیانی باکوور لەسەر نارازی بوونی خۆیان لە سنووری یەک وڵات دا رانەوەستان وە هەنگاوی هاوکاریان هاوێشت. نوێنەرانی رێکخستنەکان دژ بە یەکێتی ئەورووپایی لە هەر پێنج وڵاتی باکوور(سوید، دانمارک، نەرویج، فەنلەندا، ئایسلەندا) لە ژێر سایەی یەکێتیەکی نوێ کۆ دەبنەوە. ئەمەش وا پیشان دەدات کە شەری نێوان کەمپی ئەرێ و نا فراوانتر و گەرمتر دەبێ. کەمپی "نایی" دانمارکی داوای رێفرەندومێکی تازە کرد، دانمارک لە YX دوور دەخەنەوە کەمپی "نایی" باکوور نایانەوێ وڵاتانی باکوور لە برۆکسلەوە ئیدارە بکرێت.

بە پێی دەستووری YE بۆ ئەوەی مرۆڤ بتوانێ بەرامبەر بە بەرژەوەندی وڵاتانی باکوور رابووەستێ دەبێ یەک لە سێ دەنگەکان لە مەجلسی وەزیران لە گەڵی بێت.

مەجلسی وەزیران لە ٨٦ -٩٠ وەزیرێک پێکدێت، وڵاتانی باکوور لەم مەجلسەدا خاوەنی ١٣-١٤ ئەندامن. بەم شێوەیە ئەوان ناتوانن هیچ بڕیارێک دژی باکوور بدەن.

## ئیعدامی ٥ خەباتگێری کورد

لە رۆژەکانی ٨-١٩٩٤/٢/١٤ دا جەنازەی ٥ رۆڵەی خەباتگێری کورد بە ناوەکانی: حوسێن سوبحانی، رەئووف موحەممەدی، بەهمەن خوسرەوی، قادر موردای، و عادل عەبدوڵاهی لە ناوچەی کرمانشە لە کوردستانی رۆژهەڵات لە لایەن خەلادانی کۆماری ئیسلامی یەوە تەحویلی کەس وکاریان درایەوە.

ناوبراوان ئەندامی حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران بوون کە نزیک بە دووساڵ لەمەوبەر لە لایەن هێزەکانی رژێمی ئێرانەوە گیرابوون. هەواڵەکان وا دەگەیێنن کە ئەو خەباتگیرانە لە ماوەی ئەم دوو ساڵەدا تەنیا لەبەر دفاع لە مافی رەوای گەلەکەیان بەردەوام لە ژێر شکەنجەو ئازار بوون و تا چەند مانگ لەوەو پێش هیچ کەس تەنانەت کەس وکاریشیان لە حاڵ و جیگەیان ئاگادار نەبوون.

www.arsivakurd.org



# بۆ ئەوەی کارەساتی هەڵەبجە دووبارە نەبێتەوە



RAMNSJ

بە بۆنەی بیرەوەری شەشەمینساڵرۆژی کارەساتی هەڵەبجە لە رێکەوتی ١٦-٣-١٩٩٤ کاتژمێری ٤ تا ٨ی ئێوارە خۆپیشاندان و کۆبوونەوەیەکی بیرەوەری لە لایەن کۆمیتەی هاوکارییەوە لە ستۆکهۆلم پێکهات. لەو خۆپیشاندانەدا کە کۆمەڵێکی چەند سەد کەسی لە هاونیشتمانانی کوردی تێدا بەشدار بوون چەند ئاگاداری و بەیاننامە لە سەر یادی کارەساتە دڵتەزێنەکەی هەڵەبجە بە کوردی و سویدی خوێندرایەوە. یەک لەوان ئاگاداری فیدراسیۆن بوو کە ئەمەش دەقەکەیەتی:

رۆژی ١٨ی مارسی ١٩٩٤ شەش ساڵ بە سەر بۆمبارانی کیمیاوی شاری هەڵەبجە لە لایەن رژێمی سەدامەوە تێدەپەڕێ. لەو رۆژەدا لە ساڵی ١٩٨٨ پتر لە پێنج هەزار کەس لە ئەنجامی ئەو کارە نامرۆڤایەتیەدا کە زۆربەیان ژن و منداڵ بوون، گیانیان لە دەست دا. شاری هەڵەبجەی شەهید کە نزیکەی ٧٠هەزار کەسی تێدا دەژیا بووە شارێکی کەلاوە و وێرانکراو.

گەلی کورد بە دەیان ساڵە بۆ بەدیهێنانی مافە رەواکانی خۆی دژی داگیرکەران تێدەکۆشێ و قوربانی دەدا، ئێمرۆ بە هەزاران کەسی ئاوارە و هەڵوەدان ... تەنها لە هەشتاکان زیاتر لە ٤هەزار گوند لە گەڵ زەوی تەخت کران و خەڵکەکەی بۆ دەرەوەی ناوچە کوردنشینەکان راگوێزران ... کارەساتی هەڵەبجە تەنها نموونەیەکە لەو زوڵم و زۆرییەی کە نەتەوەی کورد دووچاری هاتووە. رژێمە داگیرکەرەکانی کوردستان، کوشتن و برین و راگوێزانی بە کۆمەڵیان کردووە بە پیشەی رۆژانەیان، بۆیە میللەتی کورد پێویستی بە پشتگیری راستەقینە هەیە دژی دەست درێژکەران. بۆ ئەوەی رژێمەکانی عێراق، تورکیا، ئێران و سوریا چیتر پلانی چەپەڵی دژ بە میللەتی کورد نەنێنەوە، بە تایبەتی هەڕەشەی رژێمی عێراق بۆ سەر ناوچە ئازادکراوەکانی کوردستان و هێرشی رژێمی تورکیا بۆ سەر ناوچەکانی خوارووی کوردستان کە لە لایەن هێزەکانی سەر بە نەتەوە یەککگرتووەکان دەپارێزرێن، بێگومان بێدەنگی نێودەوڵەتان زیاتر هانی رژێمی تورکیا دەدا کە ئاکاری دەستدرێژکارانەی خۆی بۆ سەر خاکی کوردستان درێژە پێبدا.

ئێمرۆ گەلی کورد زۆربەی خاکی کوردستانی خوارووی رزگار کردووە و دەستی بە دروستکردنەوە و ئاوەدان کردنەوەی شار و گوندە وێرانکراوەکان کردووە، ئێستاش کاتی ئەوە هاتووە کە چارەنووسی کوردستان لە لایەن گەلی کورد خۆیەوە بەڕێوە بچێ و نەتەوە یەککگرتووەکان بڕیاری لە سەر بدا، بە چەشنێک کە مافە رەواکانی گەلی کورد لە بەر چاو بگرن.

لە یادی شەشەمین ساڵرۆژی کارەساتی هەڵەبجە، فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید داوا لە هەموو هێزێکی خێرخواز دەکا کە پشتگیری لە گەلی کورد بکەن، بۆ ئەوەی میللەتی ئێمەش بتوانێ لە ژێر سایەی ئاشتی و ئازادیدا بژی.

**با دروشمەکانی رۆژی ١٦ مارس دروشمی:**

**- لە ناوچوون و قەدەغەکردنی هەموو جۆرە چەکێکی کیمیاوی و بایۆلۆژی بێ ....**

**- رووخان و نەمان بۆ رژێمە خوێن رێژەکان بێ ...**

**- پشتگیری لە مافە رەواکانی گەلی کورد بێ.**

فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید
١٠-٣-١٩٩٤

## بۆمبارانی رژێمی ئیسلامی ئێران درێژەی هەیە!

لە کاتژمێری ٢ی پاش نیوەڕۆی ١١-٣-١٩٩٤دا، دۆڵی شاوری لە کوردستانی باشوور کەوتە بەر هێرشی موشەکی گەورە، کە لە ئاکامدا زۆر لە گوندەکانی دەوروبەر وێران بوون. دانیشتوانی ناوچەکە و بنەماڵەی کوردەکانی رۆژهەلاتی کوردستان لە رووی ناچارییەوە ئاوارەی بوون و زەرەر و زیانێکی زۆر ماڵیان پێکەیشت.

دیارە ئەمە یەکەم جار نییە کە ناوچەکانی باشووری کوردستان بە بیانووی لێدانی شۆڕشگێڕانی کوردی رۆژهەلات دەکەوێتە بەر هێرشی تۆپ و موشەک. مەبەستی رژێمی ئێران جیا لە گووشارهێنان بۆ هێزە نیشتمانپەروەرەکانی کوردستانی رۆژئاوا، پێکهێنانی ئاستەنگی و تێکدانی ئاسایش لە بەشی ئازادکراوی کوردستانی باشوور.

## بۆ سەرۆک کۆماری تورکیا و حکومەت و پەرلمانی

فاکس 012 - 009903124683

رۆژنامەنووس، زانا و نووسەرانێک لە خوارەوە ناویان هاتووە تەنها بە هۆی دەربڕینی بیروڕای خۆیان کە لەگەڵ ئایدیۆلۆژی تورک ناگونجێت لەلایەن دادگای تورکیاوە سزادراون. چونکە گووتویانە کە کورد دەبێت بە مافە رەواکانی خۆی بگات لە بەر ئەوەش زیندانی کراون. مومکین نییە ئەمە بێتە سەبەبێک. پێویستە دەوڵەتی تورک بۆ راستکردنەوە هەنگاو بنێتەوە بۆ ئەمەش پێویستە ئازاد بکرێن:

**د. ئیسماعیل بێشکچی، د. فکرەت باشکایا، سەرۆکی پترۆل ئیش مونیر جەبلان، رۆژنامەنووس گوربەتەللی ئەرسونێر، ئوسمان ئایتار، حکمەت چەتیت، ئەرگون گوتمگرتم، ئەرکان ئایدین، ئوزگور ئاسلان و زۆر رۆژنامە** نووس و نووسەر و تاوانبارکراوی فیکری دیکە



## دیسان تەقینەوەی بۆمب لە دژی دۆستانی کورد!

لە رێککەوتی ١٩٩٤/٣/١٣دا دوو رۆژنامەوانی سوێد Andrs Blomdahl و Katrina Bjärvall لە گوندی بەردەرەش لە باشووری کوردستان بە هۆی تەقینەوەی بۆمب بە توندی بریندار بوون. رۆژنامەوانی ناوبراو لە دۆستانی کوردانن و لەلایەن کۆمیتەی سوێدی پارێزگاری لە مافی مرۆڤی کورد چووبوونە کوردستان. ئەندەش و کاترینا رۆژی پێشتر میوانی بیرۆی ئاگاداری لە باشووری کوردستان بوون. لە کاتی تەقینەوەی بۆمبەکە، رۆژنامەوانانی ناوبراو لە تاکسی یەک دابوون کە لە بەردەرەش را بەرەو هەولێر دەرۆیشت. بۆمبەکە لە پشتی ئەو تاکسییەدا جێگادرابوو. بە تەقینەوەی بۆمبەکە پشتی تاکسییەکە بە تەواوی هەڵدەتەکێ و سەرنشینەکانی بریندار دەبن. بەپێی ئەو هەواڵانەی لە دەست دایە (ئەندەش) بە جۆرێک بریندار بووە کە گوێیەکانی هەستی بیستیان لەدەست داوە.

ئاشکرایە دوژمنانی کورد مەبەستیان لە دانانەوەی ئەو بۆمبە تیرۆری دۆستانی بیانی گەلی کورد و نیشاندانی نائاسایی بوونی بەشی ئازادکراوی کوردستانی باشوورە.

کۆمیتەی سوێدی ماوەیەکە بە هاریکاری SIDA بۆ دابینکردنی ئیمکاناتی تەندروستی و لەشساغی لە پارێزگای دهۆک دەست بەکار بووە.

ئەندەش و کاترینا هەر لەو پەیوەندییەدا لە سەفەری سەردان لە کوردستانی باشوور بوون. ❦

## کۆنگرەی ساڵانەی یەکێتی لاوان

یەکێتیی لاوانی کورد حەفتەمین کۆنگرەی خۆی لە رۆژی ١٢-٣-١٩٩٤دا بە بەشداری ٦٢ نوێنەر و کۆمەڵێک میوان لە شیستاتریێف گرت. کۆنگرە دوای باس و گفتگۆیەکی بە سوود لە سەر راپۆرتی کار و چالاکی ساڵی ١٩٩٣، ئەو راپۆرتەی پەسند کرد. هەروەها لایەن کۆنگرەوە دەستوورێکی نوێی بۆ یەکێتیی لاوان پەسند کرا کە لە لایەن کۆمیتەی دەستوورەوە ئامادە کرابوو. کۆنگرە لە کاتژمێری ١٢ی نیوەڕۆ تا ئێوارە بەردەوام بوو. کۆنگرەوە هەروەها کۆمیتەی کارگێر و چاودێری بۆ بەڕێوە بردنی کاروباری یەکێتیی لاوان تا کۆنگرەی داهتوو هەڵبژارد کە ناوەکانیان ئەمانەن:

ئەندامانی ئەسڵی: ١ـ ئاتیە بەتی ٢ـ ئالان شوجاعی ٣ـ شەفدەر جەزیری ٤ـ ئاکۆ نەجمەدین ٥ـ شاهۆ خزری ٧ـ هەڵۆ بێکەس ٩ـ چالاک مرادرەسوڵی.

ئەندامانی جێگر: ١ـ لوقمان دەمیر ٢ـ رۆژدا چەلیک ٣ـ لوقمان ئەندیمە
کۆمیتەی چاودێر: سیامەند خزری، خورشید، حوسێن بەتی.

## نامەی پیرۆزبایی بۆ "کۆمکار"

فیدراسیۆن لەسەر ناوی کۆمیتەی گشتی نامەیەکی بۆ کۆمیتەی کارگێری کۆمکار نارد. لەو نامەیەدا وێرای پیرۆزبایی جەژنی نەورۆز، سوپاسی کۆمکار کراوە کە نوێنەرانی فیدراسیۆنی بۆ بەشداری کردن لە جەژنی نەورۆز لە ئالمانیادا بانگهێشتن کردووە، هەروەها داوای لێبوردن لە کۆمکار کراوە کە فیدراسیۆن نەیتوانیوە نوێنەرانی خۆی بۆ ئەم جەژنە بنێرێ.

لەو نامەیەدا پاش ئیشارە کردن بە پێشینەی جەژنی نەورۆز و بارودۆخی ئێمرۆی کوردستان، دووبارە لە سەر دەوری پربایەخی کۆمکار و گرینگی هاریکاری و هاوکاری هەموو هێزەکان لە پێناو بە دیهێنانی ئاواتی لەمێژینەی نەتەوەکەمان پێداگری کراوە.

## ئاگاداریەکی یەکێتیی ژنانی کورد لەسەر ٨ی مارس

**خوشکانی‌بەرێز........**
ئەمە سالی دووەمە ئێمەی ئافرەتانی کوردستان لە سوید لە ژێر سایەی یەکێتی ژنانی کوردستاندا ٨ی ئادار، رۆژی نێو نەتەوەی ئافرەتان پیرۆز دەکەین. ئێمە زۆر خۆش حالین کە بە شێوەیەکی فراوان و بەهێز خەبات دەکەین، بێگومان دامەزراندنی ی.ژ.ک یەکەمین هەنگاو بوو، دەرخستن و بلاو کردنەوەی گۆڤاری (ژن) کە دەنگی ژنی کورد لە ناو کۆمەلدا بەرز دەکات هەنگاوی دووەم بوو. وەهەر وەها نوێنەرایەتی کردنی ئێمە بۆ ژنی کورد لە نێو کۆمیتەی ((٨ ی ئادار)و لە نێو ژنی بێگانە و سویدی دا، سەربەرزیەک بوو، ئومێدەوارین کە لە پاشەرۆژدا هەنگاوی گرنگتر و بەهێزتر بەرەو پێشەوە بنێین، دەبا ئێمە دەنگی خۆمان لە پێناو ژیانێکی ئازاد و یەکسانی لە نێو ژن و مێرداندا بەرز بکەین.

**خوشکینە.......**
٨ ی ئادار بۆ هەموو ئافرەتانی جیهان رۆژێکی بەنرخە، بەلام بەداخەوە کە بەشی ئێمەی ژنی کورد لەم شاهیەدا زۆر کەمە، ئیمرۆ لە کوردستاندا شەرێکی گرنگ هەیە و گشت گەلی کورد بە خۆیەوە گرتووە. سەدەها ئافرەتی کورد لە زیندانەکانی دوژمن دا بەرگری دەکەن و بەهەزاران کچ و ژنی کورد بەشداری لە تێکۆشانی گەلی خۆیان دەکەن.
ئیمرۆ مەسەلەی نەتەوەیی کەوتۆتە پێشمان و ئەرکی ئێمە گرانتر بووە .
ئێمە وەکو ی.ژ.ک پیرۆزبایی لە ژنانی کورد دەکەین بەبۆنەی ٨ ی ئادار .

**خوشکینە.......**
مێژووی کوردستان دیاری کراووە کە بە هەزارەها ژنی کورد خۆی کردۆتە قوربانی رێگای رزگاری گەلی خۆی، نموونە زۆرن لەوانە: (**لەیلی قاسم، زکیە ئالکان، راهشان دەمیریل** و......هتد )
سلاو بۆ هەموو شەهیدانی کوردستان
سلاو بۆ هەموو ئافرەتی تێکۆشەرو قارەمان کە بۆ رزگاری ئافرەت گیانی خۆی بەخشیوە.
ئێمە وەکو ی.ژ.ک رۆژی ٨ ی ئادار جەژنی نێو نەتەوەیی گشت ژنان پیرۆز دەکەین، وە هەروەها جەژنی گشت ژنی کوردستان ؛ چ لە ماڵ و چ لە سەر شاخ و چ لە زیندانەکاندا بە دڵ و گیان پیرۆز دەکەین.

یەکێتی ژنانی کوردستان لە سوید




## چەکی تورکیا
## بەسەر خۆیدا تەقییەوە

لە تورکیا، ولاتێک کە ئەندامی ئەنجومەنی ئەورووپییە، بە ناوی دێموکراسی، ماف و تەنانەت ئازادییە سنووردارکراوەکانیش لە ناو دەبەن. هەموو ئۆرگانەکانی بەڕێوەبردن و یاسادانان و دادگاکردن گوێ لە مستی ئەنجومەنی ئەمنی نەتەوەیین و چارەسەری کێشەی کورد لە داپلۆسینی سوپاییدا دەبینن.

پیلانی هێشتنەوەی پارتی دێموکراسی (DEP) لە دەرەوەی هەڵبژاردنەکان لە مێژە دارێژراوە. تورکیا بە هەموو ئۆرگانەکانی خۆیەوە باری گرانی خستۆتە پاڵ چارەسەرکردنێکی لەشکەری و هەموو ئیمکاناتەکەی خۆی لە دژی گەلی کورد بەکار دەهێنێ. گەلی کورد وەک مەترسییەکی گەورە دەبینرێت. بەشێکی مەترسییەکە لە پەرلمان خەباتی دەکرد، بەلام لە ٢ی مانگی ئاداردا ویستیان ئەو دەنگەی کە لە پەرلماندا باسی ماف و ئازادی کوردان دەکات، بخنکێنن.

لە ٢ی ئاداردا بە بڕیاری پەرلمان کە هیچ جارێک خاوەنی ئیرادەی خۆی نەبوو، مافی ئەندامێتی پەرلمان لە حەوت پەرلەمەنتەری کورد ستێندرا. بەر لە بڕیاری پەرلمان دادگەر فەرمانی گرتنی ئەوانی دەرکردبوو و پۆلیس لە بەر دەرگای پەرلماندا ئامادە بوو. ئەمەش یەکێک لە نیشانەکانی "ئازادبوونی" ئۆرگانەکانی دەوڵەتی تورکیایە.

ئەمرۆ کە لە هەموو لایەکەوە دەنگی نارەزایەتی لە دژی ئەو ئاکارە دژە دێموکراتیانەی تورکیا بەرز بۆتەوە، پێویستە ئێمەی کورد بتوانین ئەو هەلە بقۆزینەوە و بە باشترین شێوە کەڵک لەم دەرفەتە وەربگرێت، چونکە تورکیا هەرگیز وا بە توندی نەکەوتۆتە بەر پەلاماری تەوس و سەرزنشتی دەوڵەتانەوە.

تا ئێستا هەموو هەوڵی فەرمانڕەوایانی ئانکارا ئەوە بووە کە نەهێڵن هیچ دەنگێکی دڵسۆزانە یاخود پلاتفۆرمێکی نێونەتەوەیی لە مەڕ چارەسەری کێشەی کورد بکەوێتە بەر باس و گفتوگۆ، بەلام تورکیابە کردەوەی ئەو دواییەی ئەو دەرفەتەی رەخساند کە زیاتر لە جاران پەلە لە پرسی کورد بکردرێ.

فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید بە گوێرەی توانا و لە چوارچێوەی توانست و ئەرکەکانی خۆیدا هەموو هەوڵی خۆی دەدا تا بەرپرسیارییەتی خۆی لەم بوارەدا بە جێ بگەیەنێ. فیدراسیۆن بۆ کاریگەرتر کردنی ئەو چالاکیانە داوا لە هەموو کۆمەڵەکان دەکا کە بە گوێرەی توانایان لە رێکخستنی چالاکی جۆراوجۆر لەم پێوەندییەدا و بۆ لە قاودانی سیاسەتی کۆنەپەرستانی تورکیا و بەرزکردنەوەی هەرچ زیاتری کێشەی رەوای نەتەوەکەمان درێغی نەکەن.

## بۆ کۆبونەوەی گشتی کۆمیتەی ناوەندی پارتی دیموکراسی (دیب)

فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانیەکان لە سوید ئاگادار کرا کە مافی پارێزگاریەتی دیپلوماسی پەرلەمانەتی لە پارتی ئیوە سەندرایەوە و سەرۆکی پارتی و نوێنەری بەلەدیەی شەرنەخە لە بەردەم دەرگای پەرلەمانی تورکیادا، بە دەست پۆلیس گیران.

دۆستانی بەرێز،
ئێمە وەک کۆمیتەی کارگێری فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانیەکان لە سوید بڕیاری وەرگرتنەوەی مافی پارێزگاریەتی دیپلوماسی پەرلەمانەتی لە نوێنەرانی ئێوە لە پەرلەماندا و هەر جۆرە هێرش کردن و هەرەشەی کوشتن کە لە سەر پارتی ئێوەیە بە توندی مەحکووم دەکەین و لەم بارەوە پشتیوانی خۆمان لە ئێوە رادەگەیەنین.
دیارە هەڵوێست و بڕیاری دەوڵەتی تورکیە جارێکی تریش رادەی دیموکراسی لە تورکیادا نیشان دەدا.
ئاشکرایە کە پەرلەمانی تورکیە راستەوخۆ لەلایەن ستادی ئەمنیەتی میللی تورکیەوە فەرمانی پێ دراوە و بڕیاری حکومەتی تورکیە دوژمنکاری و شەری ئاشکرایەلە دژی کوردان.
ئەم بڕیارە هەروەها دژ بە بڕیاری پەرلەمانی ئەورووپایە کە دەوڵەتی تورکیاش یەک لەوانەیە کە ئیمزای کردووە.
فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانیەکان بڕیاری سەندنەوەی مافی پارێزگاریەتی دیپلوماسی پەرلەمانەتی دژ بە مافی مرۆڤ و دیموکراسی دەزانێ و سەرەرای مەحکووم کردنی بەهەر شێوەیەک بۆی بکرێ بە بیرو باوەری گشتی ئەورووپایی رادەگەێنێ.
(ف.ک.ک.س) سەرکەوتنی ئێوە لە تێکۆشان لە پێناو دیوکراسی دا دەخوازێ.

به ناوی ک.ک فیدراسیۆن ک.ک.س.
ئەحمەد قەرەمووس
ستۆکهۆڵم ١٩٩٤/٣/٤

www.arsivakurdi.org

راپۆرتێک لە لایەن کۆمیتەی پەنابەرانی فیدراسیۆن

# کۆبوونەوە لە گەڵ ئیدارەی پەنابەراندا

لە چەند مانگی رابردوودا، کۆمیتەی پەنابەرانی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان چەند دانیشتنێکی لە گەڵ دامودەزگا میرییەکانی سویدیدا لە سەر مەسەلەی پەنابەرە کوردەکان هەبوو.

کۆمیتەی پەنابەران لەم کۆبوونەوانەدا ئەوان (وەزارەتی بێگانەکان، SIV, UN) لە مەڕ بارودۆخی ئێستای کوردستان ئاگادار بکەین هەندێ لە سەر ئەو بڕیارە نایەتییانەی کە لەم دوییەدا لە سەر هەندێ پەنابەری کورد وەرگرتراوە، راوەستانێکمان هەبێ. ئێمە گەڵێک بەڵگە و راپۆرتێکمان لە سەر هەلومەرجی کوردستان پێشکەشی ئەوان کرد. لە راپۆرتەکەدا بیر و بۆچوونی خۆمان لە سەر مەسەلەی بڕیارەکانیان و یەک لەوان ئەو بڕیارە ناڕەوایەی کە لە سەر پێنج پەنابەری کورد درابوو، بە نووسراوەیی ئاراستە کرد.

### کۆبوونەوە لە گەڵ "بێریت رۆلە ن Berith Roleen"دا

لە یەکی مانگی مارس لە "لینشۆپینگ"دا چاوپێکەوتنێکمان لە گەڵ سەرۆکی (SIV)دا هەبوو. لەم کۆبوونەوەیەدا ئەحمەد قەرەمووس، حەسەن مزگین و حوسامەدین ئەسلان لە لایەن کۆمیتەی پەنابەرانی فیدراسیۆن و بێریت رۆلەن، باریەرا .... و ستۆنیا نوردسترۆم لە لایەن (SIV)ەوە بەشداری کۆبوونەوەکە بوون.

پاش دانی زانیارییەکی زۆر لە سەر شێوازی کار و تێکۆشان و هەروەها رێبازی فیدراسیۆن، لە سەر ئەو خاڵە گرنگانەی خوارەوە گفتوگۆمان کرد.

### مەسەلەی ئەستاندنەوەی پاسپۆرتە سیاسییەکان

هەروەک دەزانن لەو دواییانەدا (SIV) بڕیاری دا کە پاسپۆرتی سیاسی چەند کوردێک کە بۆ سەفەر گەڕابوونەوە کوردستانی باشوور، وەربگرێتەوە. ئێمە لە سەر ئەم مەسەلەیە بیروڕای خۆمان دەربڕی و داوامان لێکردن تا ئەو بڕیارە یان راستکەنەوە.

ئێمە لە گەڵیاندا باسی ئەوەمان کرد کە زۆر کەس هەیە دەگەڕێتەوە باشووری کوردستان تا ئیمکاناتی پێویستی بۆ داوارۆژ و گەڕانەوەی یەکجارەکی دابین بکا، ئەوەش کارێکی پەسند و بەسوودە. ئیدارەی پەنابەرانیش لە سەر ئەو رایە بوو کە ئەو بڕیارانە بە جێ نەبوون و لەمەولاوە هەر کەسێ دەتوانێ بە دڵنیاییەوە بۆ پێکهێنانی ئیمکاناتی گەڕانەوەی یەکجارەکی بچێتەوە کوردستان.

### مەسەلەی کوردە فەیلییەکان

یەکێ لە مەسەلە گرنگەکان مەسەلەی گەڕاندنەوەی کوردە فەیلییەکان بۆ ئێران بوو. ئێمە بۆ بەرپرسانی ئیدارەی پەنابەرانمان روون کردەوە کە ئەو کوردانە کاتی خۆی بە زۆر لە باشووری کوردستان دەرکراون و لە ئێرانیش لە ژێر زوڵم و زۆری رژێمی ئێراندا بوون، بۆیە داوامان لێکردن کە لە مەڕ ئەو بڕیارەدا وردتر بنەوە و بە لەبەر چاوگرتنی هەلومەرجی دژواری ئەو کوردانە بڕیار بدەن.

### مەسەلەی پەنابەرانی کوردستانی باکوور

سەبارەت بە کوردەکانی باکوور و ئەو بڕیارانەی لەو دواییە وەرگیراون داخوازمان ئەوە بوو کە دەبێ (SIV, UN) بارودۆخی نالەباری ئەوێ لەبەر چاو بگرن. هەروەها لە مەڕ ئەو کەسانەی کە پێشتر بڕیاریان لە سەر دەرکراوە ئەو دەرفەتە بدرێ کە ئەوان دووبارە بتوانن داوای گۆڕانی بڕیارەکان بکەن.

### مەسەلەی ئەو پەنابەرانەی لە وڵاتانی باڵتیکەوە دێن

یەکێ لە خاڵەکانی باس و گفتوگۆیان لە سەر کرا، مەسەلەی ئەو کوردانە بوو کە لە وڵاتانی باڵتیکەوە دێنە سوید . هەر وەک دەزانن خەڵکێکی زۆر لە پاکستانی، عەرەب، بەلووچ و بەنگلادێشی بە ناوی کورد دێنە سوید. ئیدارەی پەنابەران دەیەوێ وەفدێک بنێرێتە ئەو وڵاتانە تا لە نزیکەوە لە بارودۆخی ئەوێ ورد بێتەوە. فیدراسیۆنیش ئامادەیی خۆی بۆ هاریکاری کردن لەو بوارەدا راگەیاند.

### ئاگاداری لە سەر تێکۆشان و چالاکی کۆمیتەی پەنابەران

نوێنەرانی فیدراسیۆن لە سەر تێکۆشان و رێبازی کار و چالاکی کۆمیتەی پەنابەران ئاگادارییەکی تێروتەسەلیان دایە ئیدارەی پەنابەران. هەروەها داوایان کرد کە لە رەوتی بڕیارداندا بۆچوونی فیدراسیۆنیش لەبەر چاو بگیردرێ چونکە فیدراسیۆن بەبێ بەڵگە و زانیاری تا ئێستا هیچ نامەیەکی بۆ ئەو ئیدارەیە لە سەر هەلومەرجی پەنابەران نەنووسیوە.

# ئاگادارییەک لەلایەن کۆمیتەی پەروەردە

### چوارچێوەی چالاکی کۆمیتەی پەروەردە

* ئامادەکردنی بابەت لە سەر چۆنایەتی کاری کۆمەڵایەتی لە دەرەوە وەک: چۆنییەتی نووسینی پرۆتۆکۆلی کۆنگرە و کۆبوونەوەکان، نووسینی پەیڕەوی ناوخۆیی، چۆنییەتی دارشتنی گەڵاڵە (پرۆژە) و روونکردنەوەی چوارچێوە و سترۆکتۆری فیدراسیۆن و هتد.

* ئاگاداری لە مەڕ ئەو یاسا و پرسانەی کە بە جۆرێ پێوەندی بە ئێمەوە هەیە یاخود ئەو ئاگادارییانەی کە بە زمانی سویدی و زاراوەی کرمانجی لە لایەن دەوڵەتەوە بڵاو دەبێتەوە.
* لەسەر ئەو پرسە کۆمەڵایەتییانەی کە کۆمەڵگای کوردی لە دەرەوە رووبەڕوویانە دەکرێ سیمینار، ئاگاداری زانستی، پانێل، کۆرس و هتد ساز بکا.

### ئاگادارییەک لە لایەن کۆمیتەی پەروەردە بۆ کۆمەڵەکانی ئەندام

ئێمە وەک کۆمیتەی پەروەردە ئامادەین کە لە مەر ئەو پرس و گرفتانەی کە لە پێوەندی لە گەڵ مەسەلە کۆمەڵایەتییەکاندا، یانیش لە پێوەندی لە تەک کار و چالاکیتان لە سویدا دەردەکەوێ بە گوێرەی توانامان یارمەتیتان بدەین.

هەروەها دەکرێ لە رێگەی نامە یاخود تەلەفۆنەوە لە سەر ئەو گیروگرفت و پرسیارانەوە بە یەکەوە بدوێن. دیارە بۆ ئەو کۆمەڵانەی لە ستۆکهۆڵم نزیکن، ئەگەر خۆیان داوا بکەن دەتوانین چاوپێکەوتنیشمان لە گەڵیاندا هەبێ.

تکایە لە نووسین یان کاتی تەلەفۆن کردندا ناونیشانی خۆتان لە بیر مەکەن.

# سەردانێکی کەمپی فلێن

کەمپی پەنابەران لە شاری (Flen) نزیکەی ٦٠ کوردی تێدا دەژی. لەوانە ٣٥ کەسیان کوردی فەیلی و لە دانیشتوانی پێشووی بەغدان کە لە سالانی ٨٠-١٩٨١ دەربەدەری ئێران کرابوون.
"باوکی تارا" نوێنەری کۆمیتەی پەنابەران لە هەرێمی پێنج بە هاوکاری "فورات" بەرپرسی کۆمەڵەکانی ئەو هەرێمە کۆبوونەوەیەکیان لەگەڵ دانیشتوانی ئەو کەمپە پێک هێنا و پاشان ماوەی دوو ساعات لە گەڵ (Christer Uddin)بەرپرسی کەمپەکە دانیشتنیان هەبوو و لە سەر داخواز و سکاڵای کوردەکانەوە گفتوگۆیان کرد. لەو دانیشتنەدا بە تایبەتی لە سەر کارەساتی خۆکوشتنی ئالان موحەممەد عەبدوڵڵا (لە بەربانگی پێشوودا بە ناوی کوردێکی فەیلی باسی لێکرابوو) راوەستان. لەو باسەدا دەرکەوت کە ئالان هیچ وەڵامێکی رەتکردنەوەی پەنابەری بۆ نەهاتبۆوە و ماوەی هاتنی بۆ سوید زۆر درێژ نەبوو و هەموو لایەک شاهیدی دەدەن کە لاوێکی ئارام و لەسەرەخۆ بوو و هیچ دیاردەیەکی مەترسیداری پێوە دیار نەبوو.
دەستەی نوێنەرایەتی کۆمیتەی پەنابەران، حەسەن مزگین و باوکی تارا لە گەڵ فورات بەرپرسی هەرێمی پێنج جارێکی دیکەش لە ٤-٣-١٩٩٤دا لە گەڵ کوردەکانی کەمپی فلێن دانیشتن و لەسەر فیدراسیۆن و چۆنییەتی کار و چالاکییەکانی ئەو رێکخراوەیە و یاساکانی سوید و کاروباری پەنابەران لەم وڵاتەدا ئاگاداری پێویستیان دایە پەنابەرانی کەمپەکە.
پاشان دەستەی نوێنەرایەتی فیدراسیۆن بۆ ماوەی ساعەت و نیوێک لە گەڵ بەرپرسانی کەمپەکە دانیشتنیان بوو و لە سەر هۆکارەکانی بەردەوامی پەناهێنانی کوردەکانی کوردستانیان بۆ سوید کرد.

# چاوپێکەوتن لە پەرلەمانی سویدی دا!

لە پێوەندی لە گەڵ بەرهەڵستکارییەکی کە بە دوای گیرانی چەند ئەندامی پەرلمان دژ بە تورکیا ساز بوو، سەرۆکی فیدراسیۆن ویلدان تانریکولو، سکرتێر مستەفا ئایدۆغان و بەرپرسی کۆمیتەی پێوەندی دەرەوە جەماڵ باتون چاوپێکەوتنێکیان لە گەڵ ئەندامی پەرلمانی پارتی چەپ (بێریت کارلسۆن) لە شوێنی پەرلماندا هەبوو.
لەم دانیشتنەدا لە سەر سیاسەتی تیرۆری دەوڵەتی تورکیا کە رۆژبەرۆژ توند و تیژتر دەبێ و لە سەر سیاسەتی گرتنی رۆژنامەنووس و کەسانی دیموکرات، هەرەها یاساخ کردنی هەموو ئەو رۆژنامانەی بە چەشنێ ئاورێک لە کێشەی کورد دەدەنەوە و مەسەلەی هەڵبژاردنی هەرێمی لە تورکیادا کەوتە بەر باس و گفتوگۆ.
بێریت کارلسۆن باسی ئەوەی کرد کە وێرای هەندێ ئەندامی تری پەرلمان هەول دەدا کە پێشنیاری پرۆتێستێک لە دژی تورکیا برێتە پەرلمان و هەول بدەن بڕیارێک لە مەر ئەو رەفتارە نادێموکراتییە دەوڵەتی تورکیا وەرگرن وکێشەی گەلی کورد لە رێگەی پەرلمانی سویدەوە بکەنە پرسێکی نێودەوڵەتی.

**جەماڵ باتون**

**بەرپرسی کۆمیتەی پێوەندی دەرەوە**

# بەربانگ


BERBANG
Box 490 90, 100 28 Stockholm

ئۆرگانی فیدراسیۆنی کۆمەلە کوردستانییەکان لە سوێد

Tel (46) 8- 652 85 85 ↔ Fax: (46) 8- 650 21 20

بەربانگ ژمارە (94)رەشەمە (ئادار) 1994

# نەورۆزتان پیرۆز بێ



- پەرلەمانی ئەوروپا و ئۆتۆنۆمی
- پەرلمانی تورکیا و کێشەی کورد
- ئاگاداری کۆمیتەکانی فیدراسیۆن
- چالاکی کۆمەڵەکان

## یادی هەلەبجەی شەهید

www.arsivakurdi.org